



## Bi libas be, nas be

Sernavê nivîsa min gotinek pêşiyên me kurdan e. Gotinek kurt e, lê wateyê wê ya mezin heye. Ji ber di xwezayê de her lawir bi kevîlê xwe, her mirov bi çand û cilên xwe tînen nasîn. Roja 10'ê Adarê Roja Cil û Bergên Kurdî ye... *Reyhan İke / R.7*



## Newroz û destpêk

Newroz, di jiyana kurdan da wek têgih, cejn û efsane xwedî cihê girîng e. Li ser bêtêya Newrozê gelek lêkolîn hatine kirin. Wek mînak di sala 2014ê da, pirtûkek Faysal Dagli bi navê "Kurd di Pirtûkên Pîroz û Mîtolojîyê da" ji Weşanên Aramê derçû... *Ahmed Karî / R.10*



## Şûna du kêran

Çil û du sal di ser darbeyên herdu kêran re bihurîne. Min ji mêj ve salên nasîti û xortaniyê li dû xwe hiştine. Lê şûnên herdu kêran mane, wînda nebûne û mîna te du fasûliyên hişk li ser kêlekê tê de çikandibin, xuya dikin... *Firat Cewerî / R.15*

Rojnameya  
Heftane

www.xwebun.org

# xwebûn

23-29 Adar 2020

Hejmar: 14

Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org

## Tu tişt nikare pêşî li hestên Newrozê bigire

Bi salan e kurd li dijî hemû astengiyan cejna Newrozê pîroz dikin û îsal ji ber vîrusa koronayê Newroz bi girseyî nehat pîroz kirin. Li şûna gund û taxan û deverên bilind ên bajarên awayekî navendî li her navçe û bajarên Bakur Newroz hat pîroz kirin. Di pîrozbahiyên de dengê tilîliyên jinên kurd li kuçe û kolananan olan da. Li başurê Kurdistanê

li ser çiyayan agirê Newrozê hat pêxistin. Li Rojhilat jî bi merasîmên rengîn ên kêmbaşdar Newroz hat pîroz kirin. Li rojavayê Kurdistanê jî ji ber ku ji hêla Rêveberiya Xweser ve qedexeya derketina derve hat ragihandin, Newroz bi girseyî nehat pîroz kirin. Îsal di peyamnên Newrozê de herî zêde daxwaza yekitiya neteweyî hat kirin... *RÛPEL - 3*




## Strana Zekiyyê

21'ê Adarê yanî cejna Newrozê sersala kurdan e. Ev cejn ji bo kurdan bi çend sedeman gelek girîng e û cejna kurdan a sereke ye. Li çar parçeyên Kurdistanê, li her bajarê Kurdistanê gelê kurd bi hezaran derdikevin qadan û bi hestên neteweyî, bi coş Newrozê pîroz dikin. Jinên kurd agirê Newrozê geş dikin. Agirek wisa vêxistine ku ne tenê li Kurdistanê li hemû cihanê xuya dike... *Veysi Varli / RÛPEL - 15*

## Cîhan li çareseriyê digere

Vîrusa koronayê (Kovîd 19) heta niha li 150 welatên cîhanê belav bûye û bilançoya kesên ku dimirin her saet zêdetir dibe. Heta niha zêdetirî 10 hezar kes mirine û her dewlet li gorî xwe tedbîran digere. Xebatên ji bo dîtina aşiyê jî didomin lê hêj aşî û çareserî nehatiye dîtin. Xwe îzolekirin û ji malê derneketin wekî çareser derdikeve pêş... *RÛPEL - 9*



## Mesela heşî û apê Farizî

Apo Fariz şono verê korekî. Şono qayt keno ke heş haniko luye fetelno. Tabi luye yamana fend û firil-diqê xo zafê. Vaz dana şona urtê di daranê tengan de vêrena ra, heş cî dime şono wexto ke mabênê î daran ra vêreno ra tey şidîno û maneno. Şidîno, heş tenge de ro, waka luye dormê heşî de êna şona, çûyê xo gêna peyra ra dana haşa qina heşî û vana "Bîrawo hirç çilç û vilç, çilç û vilç"... *Turabi Kişin / RÛPEL - 13*

Bi aliyê xwe yê derûnî-civakî ve korona... *Leyla Nisêbîni / R.8*



## Çirûskeke şanoyê heye

Şanoger Rêzan Kaya pirsên rojnameya me bersivandin û wiha got: "Li her devê Kurdistanê çirûskeke şanoya kurdî heye. Mînak li Êlihê şanoya Yenî Sahneyê berê bi tirkî dikir, niha ew jî êdî tenê listikên bi kurdî derdixin..."

Hevpeyvîn Bêrivan Kayî - Aryan Med / R.4

## Mal nîn e?

Adorno dibêje "mal qediya" (ku em bêjin "xelas-xilas bû" dê wekî; "mal rizgar bû" bê fêmkirin loma dibêjim qediya) lê ku mala rastîn giyan û bedena însan be dê mal çawa "biqede"? An jî mala ku diqede çi ye? Furûx jî dibêje "Mal reş e." Reş çi ye, tarî û nebûnî, yan tiştên din? Bi îngilîzî mal "home" bi îspanyolî "casa" ye. Bêmalên wan wiha ne: "homeless" (bêmal), "sîna casa" (bêmal) ... Lê tu "bê-maliyek" wekî ya kurdan zingezing ji dil û hinavan nayne... *Mîgîn Ronak - R.2*

## Girava Evîna Kurdî: Cizîra Botan

Xanî 20 û çend salî bû. Hat Cizîrê. Ji aliye Rojhilatê ve li bajêr nihêrî. Heyirî. Bi qewlê Osman Sebrî, "çavmat" ma. Pêşî ji ziman ket, dû re bi ziman ket. Di beşa 33. a Mem û Zînê da, bi devê Memî ji Dî-cleyê re got: "Ev şehre ye ger ji bo te mehbûb / Hasil geriyaye bo te metlûb."... *Selîm Temo / R.7*



Munewer A. Bazan

Qada 'taybet' û 'vekirî'

RÛPEL - 2



Felemez Ulug

Gelo korona proje ye?

RÛPEL - 3



Yasemîn Elban

Cejna hevpar a gelan

RÛPEL - 10



Cemîl Oguz

Aşmêke keye de ma go se bikerê?

RÛPEL - 13



## Biyar



Munewer Azizoglu Bazan

## Di demên koronayî de qadên taybet û vekirî!

Vîrusa koronayê hema bêje ji nişka ve mohra xwe li ser jiyana me hemûyan xist. Êdî ew sibeha em tê de her roj şiyar dibin, ne ew sibeh e. Ne şeva em xwe diavêjin hembêza wê, ne ew şev e. Her tişt, ji êvarê heta sibehê guherî.

Gelek analiz û nirxandinên civakî, derûnî, siyasî, aborî ji hêla zana û nezanan ve tên kirin. Em ji wek şopdarên vîrusê çanda mirovahiyê ku tim li dû fêmkirina fenomenan e, hewl didin ku vîrusê pêvajoya nû fêm bikin. Hewldana fêmkirina jî pêdiviya ewlehiyê tê. Em dixwazin xwe di ewlehiyê de his bikin. Pergala ji bo ewlehî û tenduristiya me (?) em xistin nav malan, rolên me yên civakî û malbatî careke din anîn bira me.

Yek ji kampanyayên di vîrusê de hat destpêkirin, di bin navê “li malê bimîne” de tê meşandin. Jixwe bi girtina dibistanan gelek kes, bîyê hewcedariya destûra cihê kar, mecbûrî malê bûn. Her roj bi rêya çapemeniyê û internetê ji hêla rayedarên ve kêmkirina têkiliyên civakî, ger ne pêwîst be neçûyîna kar, neçûyîna derve tê şertkirin, heta ev yek ji hêla dewletan ve wek rêbaz tê sazîkirin. Dibêjin heta ji destê we tê li malê bimînin, li malê home-office bi kar binin, dernekevin derve, tekiliyên rûbirû bibirin û hwd. Li gorî belavbûna vîrusê em dibînin ku ev tedbir di cih de ne da ku pêşya belavbûnê bê girtin.

Em werin ser mijara mayîna li malê. Em dizanin ku qadên mal (hundir) û kar (derve) bi pêşketina endustriyalîzmê ji hev cuda bûn. Beriya endustriyalîzmê mal di heman demê de yek ji qada kar (Produkt) bû û jin û mîr—heta hemû endamên malbatê—bi hev re di vîrusê de dixebitîn. Ev rewş bi xwesazkirina kapitalîzmê re bi awayekî radikal guherî. Mal/hundir bû warê jinê û derve/kar bû warê mîrê. Ev dabeşî dû re di bin navên qadên ‘taybet’ û ‘vekirî’ de kûrtir bû. Rolê van qadan li gorî zayendan hatin tanzîmkirin. Di van rojên koronayî de gelek kes wekî ku di kampanyayê de ji tê gotin, li mal in. Li gorî çavdêriyên min ên giranî li mal in, jin û zarok in. Çend tipolojiyên “jin û mîr” ên ku di vîrusê de dertên holê ev in:

-Di serî de yên ji ber zarokan ji cihê kar destûrê dixwazin jin in. Mîr ji ber zarokan zû bi zû destûrê nagirin. Lê ger jin li cihê ku di vîrusê de gelek pêwîst e (bişîşk, polês û hwd.) bişixule, mîr mecbûr dimîne destûrê bigire.

-Ger mîr û jin derfeta wan a home-office hebe, mîr home-office dike, jin li zarokan dinêre û ger wext bimîne home-office dike.

-Jin vîrusê ji bo paqijîya malê wek firsend dibînin û paqijiyê dike. Mîr danûstandina malê dikin.

-Spartekên zarokan di bin berpirsiyariya dayikan de tê çêkirin an jî kontrolkirin. Jin xwarinê çêdike, mîr firaqan diavêje makîneyê.

Têkoşina bi sedan salan a jinan ji bo wekhevî û darazîya navbera zayendan, mafên xebatê, hiqûqî, aborî û bidestxistina wan, van rolên zayendî ji holê ranekirin, heta barê jinê hin zêdetir kirin. Bêguman van rojên derasayî de hişmendî û hînbûnê me yên hezar salan ji êvarê heta sibehê neguherînin; lê “mayîna li malî” ji bo fêmkirina û têgihîştina vîrusê pergale firsendeke dîrokî ye.

Li gorî statîstîkan mîr zêdetir bi vîrusê dixe. Sedema vîrusê—ligel hîn sedemên din—aşkera ye; zêdetir jin û zarok li mal in. Di vîrusê de ironî dibe ku ne di cih de be, lê bikaranîna vîrusa koronayê wek metaforê de ne şaş be. “Qada malê” beriya ku ji hêla pergala serdest ve wek avahiya herî biçûk a dewletê bê sazîkirin, stargeha mirovahiyê bû. Temsîl û warê jiyana civakî û çandî bû. Demsala modernîteyê ku cihanê bi lezgîniyê bê ser û ber tahayyul dike û ji nû ve saz dike, ji hûrbûn û kûrbûnê re war û kêlî nehiştiye. Çawa ku jin di mal de hat dîlgirtin, fonksiyona malê guherî. Her wiha çawa ku “qada kar/derve” ji malê hat qutkirin, ji moral û nirxên civakî jî dûr ket. Bû warê nepeniyê, neewlehiyê û nexweşiyê, bû dilê modernîteyê.

# Newroz qutbûna ji pergalê ye

Newroz li hember pergala koletiyê qutbûna herî mezin e. Li gor efsaneya peşiyên kurdan gûtiyan, roja 21'ê Adarê keleha zilmê Agad rûxandiyê û kevir li ser kevir nehiştine

## Adar Şaman

Newroz, heqîqeta kurdan û agirê jiyana azad e. Vejin û berxwedana gelê bindest e. Newroz qutbûna ji hemû pergal û hişmendîya koledariyê ye. Qutbûn, hêza têgihîştina zanist û bîrdozîya jiyana azad e. Hêrs û keyfxweşî ji bo avakirina cîhanê nû bingehin in. Heger hêrs tune be, pêşketinê nû jî çênabin. Li hember metingeriyê pêwîst e hêrs hebe. Wendakirina heqîqetê, nişaneya dûrketina ji nirxên civak û xwezayê ye. Hêzgirîna ji nirxên azadiyê, ji bedewbûna hestan e. Ji bo tevlibûneke rast a ji bo têkoşina heqîqet û azadiyê, pêwîst e pergala pênc hezar salan were mehkûmkirin.

Wek pêxember Zerdeşt qutbûna ji pergalê girîng e. Zerdeşt di serdemeke wisa de li dijî zilma desthilatdariya asûran têdikoşe û zihniyeta şaristinê red

dike ku li hemû dinyayê deng vedaye. Bi bîr û baweriyê xurt û li hember pergalê disekine. Hovîtiya jiyana şaristaniyê napejirîne. Bi vî helwestê Zerdeşt, gava xwe ya yekemîn bê kêmasî diavêje.

Pêxember Zerdeşt, piştî redkirina pergala şaristaniyê, diçe çiyayên ku dergûşa şoreşa neolîtîkê ya civaka ehlaqî-polîtîk bûn. Li çiyayê Sekbanê dikeve înzîwayê. Ev tê wateya reva ji pergala koletiyê. Bi înzîwayê re dikeve lêgerîna vegera li cewher û rehên xwe û çareserî di zihniyeta şoreşa neolîtîkê de dibîne. Zihniyet û felsefeyê nû diafirîne.

Xwedîbûna ji çirava pergala serwer, çewsandin û rebenî ye. Tiştê herî baş, qutbûna ji pergala modernîteya kapitalîst û desthilatdariyê ye. Ê civaka xwezayî parçe kiriye û rengîniya civakê tune dike desthilatdariya modernîteya kapitalîst e. Civak, ne tenê ji hêla aborî ve

hatiye xizankirin; xizaniya herî mezin çandî, ramyarî û afirînerî ye. Êdî, mirov ketine rewşeke welê ku ji dîrok û çanda xwe, ji hebûn û kesayetîya xwe jî dûr dijin. Diyalektîka xweza û civakê di qaosê de ye, xitimiyê û naherîke. Nexweşiya mejî li tevahiya bedenê belav bûye. Nexweşî û vîrusên ji rizibûna pergala heyî difûrin. Der û dora xwe qirêj dikin û civakê nexweş dikin. Qeyrana herî mezin, zihniyeta desthilatdariya nexweş e.

Pênaseya wateya rastiye pir girîng e. Dewlet rastiyeke e. Lê rastiyeke wisa ye ku heqîqeta wê hatiye wendakirin. Lewma bingeha dewletê li ser berhem û keda civakê hatiye danîn. Li ser kolekirina mejiyê mirovan xwe saz kiriye û bûye amûra tundî, zilm, koledarî, şer, kuştin, qirkirin, talankirin, dagirkirin û zayendperestiyê. Qutbûna ji vîrusê pergala mêtînger ji aliyê zihniyê ve pêwîstiyê e. Azadî ji zihni-

yetê dest pê dike.

Mirov ji pergalekê hêrs nebe, jê neqehire nikare xwe jê qut bike. Em rewşa kurdan ku penaberê Ewropayê bûne dibînin ku ji welat û çanda xwe, ji ziman û axa xwe qut bûne. Ev jî dibe sedem ku mirov bikevin valahiyê.

Newroz, di dîroka gelê kurd de, li hember pergala koletiyê qutbûna herî mezin e. Li gor efsaneya peşiyên kurdan gûtiyan, roja 21'ê Adarê keleha zilmê Agad rûxandiyê û kevir li ser kevir nehiştine. Gûtiyan, roja hilweşandina keleha zilmê ya Agadê weke roja cejnê (ZAGMUK) yanî roja nû pîroz kiriyê. Dîsa li gor efsaneya Medan, 21'ê Adarê bi rêberîya Kawayê Hesinkar, paytexta zilmê bajarê Ninovayê hatiye xerakirin û ev roj weke roja nû ya Newrozê hatiye pîrozkirin.

Agirê Newrozê ji bo gelê kurd, roja vejin û berxwedanê ye. Dê nexweşî û vîrusên hene, di agirê Newrozê de biqijilin!



## Mal nîn e?

Mizgîn Ronak

Adorno dibêje “mal qediya” (ku em bêjin “xelas-xilas bû”) dê wekî; “mal rizgar bû” bê fêmkirina loma dibêjim qediya) lê ku mala rastî giyan û bedena însan be de mal çawa ‘biqede’? An jî mala ku diqede çî ye? Furûx jî dibêje “Mal reş e.” Reş çî ye, tarî û nebûnî, yan tiştên din?

Bi îngilîzî mal “home” bi îspanyolî “casa” ye. Bêmalên wan wiha ne: “homeless” (bêmal), “sîna casa” (bêmal) ... Lê tu “bêmalîyek” wekî ya kurdan zingezing ji dil û hinavan nayne. Mal, bêmal... Mala kurdan ku der e? Li ku ye mala kurdan? Bêmalîya kurdan kengî û çawa dest pê kiriye? Mesela koçberîya niha ya di şexsê koçberên Efrîn, Girê Spî û Serêkaniyê de tê jiyîn, çend km. dûrî me û malên me ye?

Îja bawer nakim ku di tu zimanî de “bêmal” wekî “bêmal” a kurdan “bêmal” be. Lew dema em dibêjin bêmal û dibin strana “lê lê bêmal” em dizanin ku bêmalî ne tiştêkî bi malê ve, bi hebûn an nebûna wê ve girêdayî ye. Na bêmal, “bêmal” e û hew! Loma kurd hemû bêmal in, di malên xwe de û bi malên xwe bêmal in û ev mînak li tu derê dinê nîn e. Niha Adorno dibêje: “Ger wisa be mala we zûde qediyayê.” Belkî jî ji roja roj ve, ji wê roja ku me ji vî welatê ji me re jî ji tu kesî re nabe ‘welat’ re got “mal”, mal qediya. An jî welat bi xwe qedandina malan e. Tew belkî her kes bêmal e lê ya wan wekî ya me kurdan naxwiyê. Ji ber ku em heyînen demborî ne û bedena me ya ku mala me ya

rasteqîn e ji me roj bi roj ber bi bêmalbûnê ve dibe.

Li aliyê din malên kurdan kesên/endamên ne li malê hene. Wekî wê strana ku niha ji zarokatiya min bilind dibe; “ne li mal, ne li mal, ne li mal e (erê sê car!) Girtiyê li hepsan ne li mal e...” Wan “ne li malên” rûgeş ne tenê li heps û zindanan in lê li koçberiyê û li welatê dîr in ku bi şaşî navê mirinê lê kirine. Em li vir bîsekînin û li bêmalî, bermalî (erê bermalî berê tenê navê sivnikê-li hin herêman- û jinên malê bû, niha wateya xwe berfireh kiriye) û li bêmalîya xwe binêrin. Ev malên ku wekî “beden” e me dipêçin û ew bêmalîyên ku wekî “xanî û avahiyan” em dorpêç kirine çî yên me ne? Li ser şopa strana “lê lê bêmal” em gulên

kijan malên qediyayî ne?

Furûx rîsteya xwe li vî gotarê bar dike û careke din dibêje: “mal reş e.” Mal reş e erê. Mal tarî ye. Lewre yan em, an jî ezizên berdilan ne li mal in loma jî mal bêmal e, qediyayê, reş e. Em li dîr an jî li nêv malên xwe yase-minên bêmalîyê ne û Kurdistan bi Kurdistan vedibin. Li nêv malên hilweşiyayî û ava, yên tije û vala, siya bêmalîyek ebedî ne em. Loma jî niha di vî ewara bêmal de dibêjim; mal nîn e mal nîn e! Beden jî nîn e, xanî jî. Lew çav, ji sedî tenê (li gorî encamên zanistî yên dawî) pazde dibîne. Ger mîlek hebe, miheqeq ew di nav jî sedî heştê û pêncan de çih digire ne di nav korbîniya jî sedî pazde de ye. Stêrka êvarê ya ku diya min û hemû ezîzekan man lê dest dihejinin jî dibêje; mal nîn e, mal nîn e. Mal her der e û ne tu der e. Mal her beden e û ne tu beden e. Mal, her dem e û ne tu dem e. Bi nî-nemalî dibêjim; mal baş!

## Xweşkanî

Felemez Ulug



## Gelo korona proje ye?

Di van demên dawî de yekem rojewa cihanê bûye vîrusa koronayê. Felaketa tenduristiye mirovahiye xistiye bin me-tirsiyek mezin. Heta niha tu rêyêke çareseriyê ya ku dilê mirovan rehet bike derneketiye holê. Gelo bi rastî ji asta ilm û zanistî li hemberî vebaya mezin bê çare maye ango hin aliyên tarî pêşî li rêya çareseriyê digirin.

Di halê heya de mirov dikare bêje ev vîrus îro li hemû welatan belav bûye. Lewma hemû welat li hemberî vîrusê di nav têkoşinê de ne. Her welat di çarçoveya derfetên heya de hin tedbiran digirin. Lê di daxuyaniyên tîn dayîn de tiştê ecêb û mirov matmayî dihêle ew e ku tê gotin ev vîrus pîr û kalan bandor dike. Yanî bi awayekî zirav û politîk dibêjin ku bila kes netirse yên ji ber nexweşiya vîrusê jiyana xwe ji dest didin pîr û kal in ew jî di nav civakê de giran in. Mixabin dema mirov li asta tedbir û nixandînan rayedaran mêze dike ev rastî bi awayekî vekirî tê ditin. Ev tîgîh, tîgîha pergala kapitalîzmê ye. Li gor vîrusê pîr û kal êdî nikarin kar bikin û di nav civakê de nikarin aktîf bibin her tim dibin bargirani. Lewma hin welat bi awayekî vekirî nebe jî got ku "Li gor pêşveçûna vîrusê em ê tedbiran bigirin" yanî dixwazin bêtîr ger vîrus derkeve derveyî hedefa hatiyê diyarkirin ew ê mudaxele bikin. Lewma piştî van nixandînan û daxuyaniyan pîrsa gelo ev vîrus di jêzeminên laboratuvaran de hatiyê çekirin, tê bîra mirov. Ger tiştekî bi vî rengî hebe ev sîcê mirovahiye yê herî mezine.

Lê wek her vîrusê, vîrusa koronayê jî di metabolîzmaya xwe de diguhere lewma li gorî agahiyên ji navendên lêkolînê tenduristiye tîn dayîn, li hemberî vîrusa tîpa nû ya koronayê (Kovîd-19) ciwanên gihaştî jî êdî ji vîrusê bandor dibin. Niha êdî hedef ne pîr û kal in êdî di nav civakê de beşa herî aktîf a kar û xwedî ezmûn bûye hedefa vîrusê. Ji ber vîrusê jî di qada navneteweyî de alarma tehlûkeyê ketiye dewrê.

Li hemberî vîrusa jî jêzeminê Çînê derket holê heta niha rêyêk çareseriyê nehatiyê ditin. Hin welat li gorî asta xwe ya ilm û zanistê heta radeyekê tedbirên xwe girtin. Hin welat jî bi rêyên cuda li çareseriyên digerin. Bi taybetî welatên zedê girîngiyê nadin ilm û zanistê hewl didin ku bi rêyên cuda bersivê bidin civaka xwe. Yek ji van welatan jî Tirkiye ye.

Reveberiya Erdogan ji roja destpêkê ve li nixandînan û daxuyaniyên xwe ve da diyarkirin ku ew li hemberî vîrusê tê jiyîn neçar mane. Ligel ku hemû cihan dizanî li Tirkiyeyê hin kes bi vîrusê ketine jî rayedaran ev rastî her tim veşart. Di halê heya de her çiqas hin hejmar hatibin dayîn jî ev hejmar ne rast in û rewşa tehlûkeya li Tirkiyeyê tê jiyîn nade aşkerakirin.

Tayyip Erdogan ji bo çareseriyê vîrusê rêyêk jî çar gavan pêk tê, pêşniyar kir. Ev çûbûn; yekemîn sebir, duyemîn dia, sêyemîn dîn û çaremîn jî îman bû.

Me got asta ilm û zanistê girîng e. Bi van pêşniyarên Erdogan, gelo dewleta tirk wê çiqas bikaribe pêşî li vîrusê bigire. Di halê heya de vîrus jî ji bo hin bi bandor bibe di nav xwe de diguhere wek me li jor jî got êdî hedef ne pîr û kal tenê ne, di hedefa vîrusê de êdî ciwan jî hene. Lewma pêwîstî heye ku rayedar êdî dev ji xwe berdin û ji bo tenduristiya civakê tevbigerin.

## Vîrusê pêşî li hestên Newrozê negirt

Îsal Newroz ji ber vîrusa koronayê ji her salê cuda hat pîrozkirin. Li şûna mitîngên girseyî her kesî li pace û şaneşînên xwe Newroz pîroz kir û dirûşmên yekîtî û azadiyê qîr kirin

Navenda Nûçeyan

Cejna Newrozê, li bakurê Kurdistanê jî ber wateya xwe ya berxwedêr tim bi rê û rêbazên cuda hatiyê pîrozkirin. Ji ber wateya wê ya serhildana mezlûman a li dijî zaliman dewletê bi salan destûr neda ku kurd Newrozê bi coş pîroz bikin. Ji ber vîrusê yekê salên dîr û dirêj, kurdan li gund û taxên xwe Newroz pîroz kirine. Li bajarên jî li deverên bilind agirê Newrozê jî aliyê şoreşgerên kurd ve her hatiyê pêxistin. Kurd qet ji tîna agirê Newrozê bê par nemane. Ev yek heta salên 1990'î jî berdewam kiriye.

Di salên 1990'î de bi berdelên gelek giran kurdan pîrozbahiyên Newrozê girseyî pîroz kirine. Li şûna gund û taxan û deverên bilind ên bajarên bi awayekî navendî li her navçe û bajarên Bakur Newroz hatin pîrozkirin. Lê heta ku pîrozbahiyên Newrozê gihaştin vîrusê, xort û dayikên kurdan bi milyonan çû û guleyên hêzê ewlehiyê yên dewletê xwarin. Ji bilî yên hatine qetilkirin, şopên van çû û guleyan li ser laşê bi hezaran kurdan hene.

## Ketin asteke din

Piştî van berdelên giran, di salên 2000'î de pîrozbahiyên Newrozê derketin asteke din. Bi beşdariya bi milyonan kesên Newroz hatin pîrozkirin. Ji bo Newrozê li seranserê cihanê bi hezaran kesên berê xwe dan bakurê Kurdistanê û şahidî ji şahiya Newrozê re kirin. Di heman demê de peyamên kurdan ên aştî û azadiyê jî li qadên Newrozê guhdar kirin. Di van salan de jî her çiqas hikûmetan hewl dabe ku pêşî li vîrusê kurdan bigirin jî bi ser neketine.

## Start û şîra îsal

Îsal jî ji bo berdewamkirina vîrusê bi rojan amadekarî hatin kirin. Di 11'ê adarê de bi beşdariya hevserok, hevberdevk, serokên giştî û nûnerên Kongreya Civaka Demokratîk (KCD), Partiya Herêmên Demokratîk (DBP), Partiya Demokratîk a Gelan (HDP), Kongreya Demokratîk a Gelan (HDK), Tevgera Jinên Azad (TJA), Partiya Azadî, Komeleya Şoreşgerên Demokratîk a Kurd (DDKD), Partiya Însan û Azadî (PÎA), Partiya Komunîst a Kurdistanê (KKP), Platforma Demokratîk a Kurdistanê (PDK-Bakûr) starta Newrozê bi civîneke çapemeniyê hat dayîn. Şîra Newrozê jî weke "Ji bo Azadî, Yekîtî û Demokrasiyê



Werin Newrozê" hatibû diyarkirin. Beşdarên civîne banga tevli-bûna Newrozê li gelê kurd kir û daxwaz kir ku her kes biherike qadên Newrozê û daxwaza yekîtîya neteweyî ya gelê kurd, azadî û demokrasiyê bike.

## Banga pîrozkirinên alternatîf

Lê li gel van hemû amadekarî, bang û daxwazan jî pîrozbahiyên Newrozê yên girseyî, ji ber vîrusa koronayê ku ji meha kanûna 2019'an ve li Çînê peyda bû û li seranserê cihanê belav dibe, betal bûn. Lê li gel vîrusê betalbûnê jî li gelek gund û taxan Newroz hat pîrozkirin. Dîsa HDP'ê jî di nav hefteyê de bi daxuyaniyekê bal kişand ser betalbûna pîrozbahiyên girseyî yên Newrozê û ji welatîyan xwest ku di 20'ê adarê de saet di 20.20'an de derkevin pace û şaneşînên malên xwe û bi ronahiyên telefon, lembeyên destan, meşale, tilfilî û stranên Newroza îsal pîroz bikin.

## Kuçe û kolan xemilîn!

Di saeta ku hatibû diyarkirin de hem li navçe û bajarên bakurê Kurdistanê hem jî li gelek navçe û bajarên mezin ên Tirkiyeyê, bi hezaran kes derketin pace û şaneşînên malên xwe û Newroz pîroz kirin. Di van pîrozbahiyên de dengê tilfilîyên jinên kurd li kuçe û kolanên olan da. Dîsa find, meşale û ronahiyên telefonan û lembeyên destan kuçe û kolan ronî

kirin. Kuçe û kolanên ku bi find, meşale û ronahiyên telefonan û lembeyên destan ronî bûn, bi stran û dirûşmeyên yekîtî û azadiyê jî xemilîn.

## Pîrozbahiyên parçeyên din

Li aliyê din jî ber ku vîrusa koronayê li her du parçeyên din ên Kurdistanê jî heye (li Rojava hîn nehatiye teşhîskirin), Newroz li van jî mîna bakurê Kurdistanê bê girseyî hat pîrozkirin. Li başûrê Kurdistanê li ser çiyayan agirê Newrozê hat pêxistin. Li Rojhilatê jî bi merasîmên rengîn ên kêrmeşê Newroz hat pîrozkirin. Li rojavayê Kurdistanê jî ji ber ku ji hêla Rêveberiya Xweser ve qedexeya derketina derve hat ragihandin, Newroz bi girseyî nehat pîrozkirin. Mîna bakurê Kurdistanê li vir jî her kesî li gorî derfetên xwe li malên xwe Newroz pîroz kir.

## Dengê azadî û tîkoşinê

Di serî de KCD, TJA, HDP û HDK gelek partî û rêxistinên kurdan bi daxuyaniyên cuda Cejna Newrozê pîroz kir. Partî û rêxistinên şahidên Newrozê bi bîr anîn û ragihandin ku ew di wê baweriyê de ne ku Newroz li dijî şer, zilm, newekhevî, zext û girtinê jî her demê bêhtir dê bibe dengê azadî û tîkoşinê. Her wiha ragihandin ku biryardariya gelan a li dijî politîkaya înkâr û tunekirinê, israra jî bo jiyaneke nû û azad wê bidome.

## Bila Newroz bibe bingeha tifaqa neteweyî

Konseya Rêveber ya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) Cejna Newrozê peyamake nivîskî pîroz kir. KNK'ê di destpêka daxuyaniya xwe de qala wateya Newrozê kir û wiha got: "Newroz li ser bingeha tîkoşîna li dijî bîndestiyê pêk hatiyê. Li dijî zilm, koletî, dagirkerî, kolonyalîzm û her reng bîndestiyê bûye stêrka rizgarî û azadiyê."

KNK'ê bal kişand ser qedexeyên Newrozê yên di nav demê de û diyar kir ku serdestan tim cejnên ku bi naverok û sembolên xwe ve bûne hawara gel û çînen bîndest qedexeyê kirine, qeyd û bend li ser danîne û yên ku ev cejn pîroz kirine jî dijmin û xayîn îlan kirine. Di berdewama daxuyaniya xwe de KNK'ê destnîşan kir ku gelê kurd û hevçepêrên wan Newroz bi keda xwe ya helal kirine şahiyê mezin û bi tîkoşîna xwe ya heq a li gund, bajar û zindanan kirine çepêrê tîkoşîna rizgarî û azadiyê.

KNK'ê destnîşan kir ku yek ji xala girîng a naveroka Newrozê neteweyîbûn e û bi van daxwazan daxuyaniya xwe bi dawî kir: "Di vî qonaxa girîng a pêvajoya tîkoşîna rizgarî û azadiya Kurdistanê de agirê Newrozê divê bibe ronahiyeke geş a tifaqa yekîtîya gel û neteweya Kurdistanê. Bi vî bîr û baweriyê Newroza hemû kurd û kurdistanîyan bi dilgermiya neteweyî û niştîmanî pîroz dikin."

## Rêveberiya Xweser xwest ku erêkirina azadiyê zêdetir bibe

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî bi peyamê nivîskî Newroz pîroz kir. Rêveberiya Xweser diyar kir ku ew wateya Newrozê di berxwedan, jiyân û azadiyê de dibînin û di heman demê de soza xwe ya şopandina li ser rêya dad, azadî û tîkoşîna li dijî zordariyê ku ve-

diguhere hezar salan, nû dikin. Rêveberiyê jî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê xwest ku hezkirin û erêkirina xwe ya ji bo projeya azadî û wekhevîyê û biratiya gelan û neteweya demokratîk zêdetir bikin û Cejna Newrozê li hemû gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pîroz kir.



## MOTÎVASYONA ME YA HERÎ MEZIN GELÊ ME YE

## Şano kurdî bi zarokan dide hezkirin

→ Bêrivan Kayi - Aryan Med

Berê dihat gotin ku pere hebe şano heye, tune be şano jî tune ye, mîna sînemayê. Lê piştî me dît ku bêyî pere û derfetên şaredariyan jî şano dikare bê kirin û em dikarin bêjin ku tenê du tişt hewce ne; lîstikvan û temaşevan. Pirsgirêka me ya herî mezin peydakirina tekstên ji bo lîstikan e

## Rêzan Kaya kî ye?



Di 1985'an de li Amedê ji dayik bûye. Malbat wê ji Mêrdînê hatiye Amedê. Piştî dibistana amadekariyê xelas dike, di 2001'ê de tev li kursa şanoyê ya Şaredariya Bajêrê Mezin a Amedê dibe. Di 2005'an de li Erziromê Zanîngeha Ataturkê dest bi beşa şanogeriya dike. Di 2009'an de piştî derçûna ji zanîngehê li Şanoya Bajêr a Amedê de dest bi xebatên xwe yên şanoyê dike. Ji wê çaxê ve ye bînavber di Şanoya Bajêr a Amedê de dilîze.

Hevpeyvîna vê hejmarê bi şanogera kurd Rêzan Kaya re ye. Em bi Kaya re li ser rewşa şanoya kurdî, astengî û pirsgirêkên şanoyê axivîn. Her wiha karakterên jinê ya di şanoya kurdî de û şanoya ji bo zarokan jî du mijarên sereke yê hevpeyvîna ne. Kerem bikin em bala xwe bidin pirs û bersivên der barê şanoya kurdî de.

### Şanoya bajêr kengî dest bi şanoya kurdî kir? Hûn dikarin qala çîroka Şanoya Bajêr a Amedê bikin?

Şanoya Bajêr a Amedê salên 90'î dest bi xebatên xwe kir. Lê destpêkê bi zimanê tirkî bû. Ji ber ku di salên 90'î de derfeteke şanoya bi kurdî tune bû. Di van salan de şanoya Jiyana Nû mînak e ku şanoyê bi kurdî dike li Stenbolê. Di 2004-2005'an de li Amedê yekem car lîstikeke bi kurdî hat lîstin. Di her serdemê de sê lîstikên bi kurdî yek jî bi tirkî dihat lîstin. Ji 2009'an şûn de êdî repertuara me bi tevahî bû bi kurdî. Şanoya bi tirkî ya wekî bi navê Şanoya Dewletê jixwe hebû, me xwest ya bi kurdî jî li Amedê hebe. Ji vê pê ve jî tenê lîstikên bi kurdî hatin lîstin. Em her sal sê lîstikên mezinan, yek an jî du yên zarokan derdixin. Di 2015'an de jî êdî me dest bi lîstikên zarokan ên bi dimilî jî kir.

### Ji bo zarokan lîstikên şanoya kurdî pir hindik in. Di rewşa heyî de bi giştî şanoya kurdî bi taybetî jî koma we ya şanoyê, ji bo zarokên kurd dibin bersiv?

Bêguman têr nakin. Ji ber em salê tenê lîstikek an jî du lîstikên zarokan derdixin. Li gor min bila lîstika ji bo mezinan yek be, yê zarokan jî sê bin. Wexta zarok tenê şanoyê lîstikeke bi zimanê kurdî temaşe dikin, bandora ziman li wan dibe. Piştî şanoyê temaşe dikin diçin li malê bi kurdî diaxivin. Mînakên wisa hene. Yanî her çiqas zimanê serwer ê berbelav tirkî be; dibistan, xêzefilm û hwd. hemû bi tirkî bin jî, dema tîna şanoyê û zimanê kurdî dibihîzin, ev yek jî bandoreke baş li wan dike. Em dizanin ku asimilasyon jî zarokan dest pê dike. Zarokan beriya heft saliyê, dişîna dibistanê û ji ber vê jî zimanê dayika xwe ji bîr dikin. Armanç çî ye; ji malê derxe, ziman asimilê bike, zihniyetê biguherîne.

### Komên şanoyê yê bi kurdî gelek kêr in. Tevî derfetên kêr û mercên zehmet hûn şanoya bi kurdî dikin. Motîvasyon û armanca we ya sereke çî ye?

Belê şanoyên bi kurdî çiqas kêr bin jî, li her devera Kurdistanê çirûsêke şanoya kurdî heye. Mînak li Êlihê şanoya Yenî Sahneyê berê bi tirkî dikir, niha ew jî êdî tenê lîstikên bi kurdî derdixin. Berê dihat gotin ku pere hebe şano heye, tune be şano jî tune ye mîna sînemayê. Lê dema ku qeyûm hatin em ji karê me yê şanoyê derxistin, piştî me dît ku bêyî pere û derfetên şaredariyan jî şano dikare bê kirin. Lê em dikarin bêjin tenê du tişt hewce ne; lîstikvan û temaşevan. Her du hebin şano, li her deverê dikare bê kirin. Dema şaredariyê di nav wan derfetên berfireh de mirov dikaribû gelek tiştan bike lê tişt girîng ew e ku di bîderfetiyan de mirov dikaribe berdewam bike. Mînak, ev maseya



ku em niha li derdorê ne, di her lîstikekê de çî digire. Yanî maseyek jî hebe mirov dikare şanoyê bike, ev jî bi motîvasyonê re girêdayî ye û ji xwe motîvasyona me ya herî bi hêz û mezin jî gelê me bixwe ye.

### Ji derveyî wergêrên berhemên biyanî, hûn di peydakirina lîstikên kurdî de zehmetiyê dibînin, têra xwe lîstikên kurdî hene li gor we?

Ya rast em dikarin bêjin ku peydakirina lîstikan pir zahmet e. Ev pirsgirêkeke pir mezin e. Mînak, me pêşbirkeke tekstên kurdî çêkir, me çend caran ceriband û xelat jî hatin dayîn. Dema nivîsîna bi giştî û nivîsîna şanoyê wekhev bê dîtîna pirsgirêk derdikeve. Di van pêşbirkan de lîstikên dihatin jî her çiqas naverokên xweş bûn jî, li ser sahnê pirsgirêk derdeketin. Ji ber vê jî peydakirina lîstikan pir zehmet e. Carna jî hevalên me dibêjin wisa be hûn binivîsin. Hûn bi şanoyê dizanin lê zanebûna şanoyê bi serê xwe têr nake. Divê şano û edebiyat ji her alî ve hevdu temam bikin.

### Di şanoya kurdî de rola jinê çawa ye?

Di şanoyên kurdî de şanogêrên Mencilê, ya Sarya Baran a li Rojava hemû jin in. Nivîyê şanoya me jî jin in. Berê her çiqas malbat û civak astengiyên mezin bûn jî niha jin êdî di şanoyê de jî hene û di rola sereke de ne. Di nav tekstan de rola jinê qels e. Em lîstikên karakterên wan ên jin qels bin, tu carî nalîzin an jî diguherînin. Berhemên Shakespeareyî jî aliyê karakterên jin ve bi pirsgirêk in. Di berhemên wî de jin her tim karakterên xerab in. Mînak, di Macbethê de, dîsa ya xerab Leydî Macbeth e. Di Othelloyê de jî ya xerab dîsa jin e. Di lîstika me ya dawî ya bi navê Xewna Şeveke Havînê de rola jinê klasîk bû û me ew guherand. Em bi taybetî jî dêhna xwe didin naveroka berhemên ka li gorî rolên zayendî ya civakî ne an na? Û li gorî wê naverokê diguherînin. Lê em dikarin bêjin, karakterên jin ên Darîo Fo (Wê Hesab Neyê Dayîn) hinekî jî yê Shakespeare û Moliereyî cudatir û li pêştir in. Ji ber vê yekê jî em û şanoyên kurd, Sarya Baran (Rojava), Jiyana Nû (Stenbol) lîstikên Darîo Fo zêdetir tercîh dikin.

**We Mem û Zîn jî derxist ser sahnê. Heger em karakterên Zînê û yê**

### Ophelia-Mariana-Valere-Thisbe û Hippolytayê bidin berhev, tu yê têkil-darî van karakteran çî bêjî?

Hewce ye di serî de em vê yekê di nav wêjeya kurdî de binirxînin. Di lîstika Mem û Zîn û ya Romeo û Julietê de dema ku bi awayekî wêjeyî didin ber hev, serkeftina Ehmedê Xanî ew e ku du evînan bi hev re hûnandiye. Lê Shakespeare nekariye vê yekê bike û tenê evîna bi rengekî heye. Ya din jî mînak Ophelia jineke pir masûm e û tiştêkî wê tune ye lê belê li ber xwe nade û xwe dike. Hamlet jê re tiştên nebaş dibêje û radibe dibêje ez ê xwe bikujim. Berxwedana wê jî xwekuştin e! Yanî bi awayê klasîk berdewam dike. Di varyanteke Mem û Zînê de ya tirkî çêkiriye, Zîn xwe dike. Lê di Mem û Zînê de ya me çêkiriye Zîn namirê û jixwe jineke berxwedêr e Zîn. Karakterên Zînê jî pir serkeftî ye. Mesela di dawiyê de Bekoyî efû dike ligel hemû nebaşiyên wî. Zîn nakeve nav hêrseke heyfildanê û wî efû dike. Yanî em dikarin bêjin ku Zîn di vir de hem bi awayekî analîtîkî hem jî bi hesiyarî tevgeriye.

### Cihê şanoyê di çand û hunerê de çî ye û bi taybetî jî dikarî ji bo çand û hunera kurdan binirxînin?

Camêrek heye navê wî Metîn Anit e. Di nav şanoya tirkî de xwedî ciyekî saxlem e ev camêr. Bajêr bi bajêr geriyaye li Mezopotamya û Anatolyayê û pirtûkên nivîsîna li ser çanda şanoya gel in. Ev mîrik di van pirtûkên xwe yê qerax de navê çanda şanoya gelên Mezopotamyayê wekî "Dîroka Şanoya Tirkî" bi nav kiriye. Heger em li ritûelên çanda xwe meylet bikin em ê bibînin ku di nav ritûelên me de rastiya Metîn Anit berovajî kiriye dê derê holê. Folklorê kurdan wekî ya tirkî nîşan daye. Helbet ev yek jî ji nêzikatiya me ya em li çanda xwe xweyîtiyê nakin, ji nêzikatiyê me yê ku li hember folklorê xwe em xemsar in û çanda xwe kêr dibînin derketine holê. Wekî tê zanîn ku piştî kurdan îslamiyet qebûl kir, ji çanda xwe ya şanoya xwezayî jî dûr ketin û êdî ew lîstik guneh hatin hesibandin. Piştî jî jixwe di nav me de şano an jî lîstik qels dibin û li wan xweyîtiyê nayê kirin. Bêguman ev yek pir bi êş e. Mînak di zanîngehê de tê gotin ku meddax awayekî lîstika çanda tirkî e. Lê niha em lê dinêrin ku meddax di nav kurdên rojhilatê Kurdistanê de hatiye lîstin û wisa belav bûye. Deng-

bêjî jî hinekî meddaxî ye lê tenê awayê wê guheriye; mendîla li ser piştê û gopalê di dest de tune ye, guheriye. Roja me ya îro kurd êdî li şanoya xwe xwedî derdikevin. Îro şano jî filmên sînemayê hîn zêdetir rastî eleqeyê tê. Şano jî aliyê hîskirinê ve biqewetir e, şênber e. Me festîvalek çêkir eleqeyê pir baş bû. Me festîvala sînemayê jî çêkir lê temaşevan pir hindik bûn. Şano di nav kurdan de her diçe bi pêş dikeve û rastî eleqeyê baş tê.

### Rewşa şanoya kurdî ya li rojhilat, başûr û rojavayê Kurdistanê çawa ye, tu çawa dibînin?

Em çûn Rojava, Başûr û Rojhilat jî. Li Rojhilat em rastî rewşeke pir baş hatin. Li Saqîzê festîval tîna çêkirin. Li vê derê heta 1'ê şevê jî lîstik tîna lîstin û temaşekirin. Ev lîstik jî tenê yê li rojhilatê Kurdistanê bûn. Rewşa şanoya Başûr hinekî cuda ye. Lîstikên li Başûr hinekî bi terzekî evropayî ne. Lîstikên xwe zêde nû jî nakin, hema çî hebe wan dilîzin, yanî nivîskar çî nivîsîbe, di naveroka metnê lîstikê de çî hebe wê dilîzin, naguherînin ango nû nakin. Lê bi rastî jî Şanoya Sarya Baran a li Rojava bi her awayî balkêşiya xwe datîne holê. Li ser medyaya civakî jî ez wan dişopînim her hefte lîstikan derdixin. Li Rojava di nav wan şert û mercên giran de her hefte pêşkêşkirina lîstikan tiştêkî pir pîroz e.

### Em dizanin ku piştî desteserkirina qeyûman hûn jî karê xwe hatin derxistin. Vê rewşê bandoreke çawa li kar û barên we yê şanoyê kir?

Em êdî nikarin herin her deverê (biken). Berê dema ku me dixwest ji bo şanoyê em diçûn her deverê. Niha jî aliyê teknîkî ve derfetên me pir kêr in. Ji ber vê jî êdî em hewl didin derfetnên xwe bi xwe biafirînin. Helbet bi piştigiriya hin sazîyên sivil û hin şaredariyên mayî jî em li ber xwe didin lê piştigiriya herî mezin gel dide me. Mînak, çend hefte berê em çûn Şîrnexê gundê Baldiranê. Cara yekem bû ku dê şanoyê temaşe bikin. Ji bo lîstika ku dê saet di 5'an de dest pê bike, temaşevan saet di 1'ê de hatin cihê lîstikê. Me dekora xwe amade dikir û li avakirina dekorê jî temaşe kirin. Li hin deveran hevşaredar hatin ji texte û paletan sahne avakirin. Mînaekeke din jî, piştî şerê li Sûr û Cizîrê, em li Cizîrê jî derketin ser sahnê. Wê demê piştî lîstikê yek hat got, "Piştî şer ev cara yekem e ku em hewqas kenîyan. Tevî hemû nebaşiyên jî em ê bikenin. Her çiqas em tîxistibin nav derûniyeke nebaş jî em ê bikenin." Van gotinan û vî nêzikatiyê, ez pir hestiyar kirim û ligel germahiya 56 pileyî em hîn bihêztir lîstin.

### Di vî serdemê de ku êdî gelek tişt dijitalîze bûne, eleqeya şanohezan ji bo şanoya we çawa ye?

Li gor min eleqeya temaşevanên kurd her diçe ji bo şanoyê zêdetir dibe. Bi saya şanoyê jî jiyana dijitalî hinekî dûr dikevin. Em vî yekê jî eleqeya ji bo lîstikên xwe jî dibînin. Di vî serdema teknolîyê de, şano maneviyat, şênberî û hîskirinê pêşkêş dike. Ji ber vî jî şano dike ku gel zêdetir berê xwe bide maneviyat û hîskirinê.



# Newroz

## Pîroz Be

Werin em vî agirê  
azadiyê dîsa bi coşeke  
mezin gur bikin. Newroz  
agirê dilê hemû mirovên li  
benda azadiyê ne. Bi  
baweriya dê Newroz bi  
xwe re aşî, azadî û  
biratiyê bîne... Em  
Newroza gelê xwe  
pîroz dikin!

Hevşaredarên  
Xalfeliyê û Endamên  
Meclisê



# Newroz

## Pîroz Be

Agirê newrozê sedan sal  
in li hemberî zilm û  
tarîtiyê pêxistî ye lê niha  
ev agir ji bo aşî û  
demokrasiyê dixwaze  
govendê bigire... Bi coş û  
germahiya agir, em  
Newroza gelê xwe  
pîroz dikin...

Hevşaredarên  
Silopiyayê û Endamên  
Meclisê



# Newroz

## Pîroz Be

Di van rojan de ku ji her  
demê bêhtir pêdiviya me  
bi yekitî û hevgirtinê heye,  
em hêvî dikin Cejna  
Newroja mizgîniya  
biharê ye, bibe wesîleya  
tenduristî, aramî û  
xweşiya gelê me. Cejna  
we ya Newrozê  
pîroz be...

Odeya Bazirganî û  
Pîşesaziyê ya Amedê



# Newroz

## Pîroz Be

Newroz her tim bûye  
sembola berxwedan,  
azadî û wekhevîyê.  
Daxwaza me ev e ku ev  
Newroz jî, ji bo gelê kurd  
û gelên Rojhilata Navîn û  
hemû gelên cîhanê bibe  
wesîleya azadî, aşî û  
demokrasiyê.

Hevşaredarên  
Licê û Endamên  
Meclisê





# Newroz

## Pîroz Be

Gelên Rojhilata Navîn bi sedan sal in, Newroz a nîşaneya azadî, berxwedan û aştiyê ye, wek cejnê pîroz dîkin. Em ê îsal jî bi dirûşma aşti û wekheviyê Newroza xwe pîroz bikin. Hêvî dîkin ku bi boneya Newrozê her kes hev hambêz bike û bi coşeke mezin tev li Newrozê bibe.  
Newroza we pîroz be!

Hevşaredarên  
Çinarê û Endamên  
Meclisê



# Newroz

## Pîroz Be

Nîşaneya berxwedan, azadî û wekheviyê ye Newroz... Sembola xwedîderketina li rûmetê ye Newroz... Cejna Newrozê li hemû kurdan û gelên Rojhilata Navîn pîroz be!

Hevşaredarên  
Panosê û Endamên  
Meclisê



# Newroz


## Pîroz Be

Newroz li hemberî tarîtiyê, ronahî ye,  
Newroz li hemberî zilmê, serhildan e,  
Newroz li hemberî koledariyê, azadî ye,  
Newroz li hemberî şer, cejn û seyran e,  
Bi hêviya rojên bêşer em li gelê kurd û  
gelên cîhane pîroz dîkin...

Hevşaredarên  
Erxeniyê û Endamên  
Meclisê



Reyhan Îke



# Bi libas be, nas be

Sernavê nivîsa min gotinek pêşiyên me kurdan e. Gotinek kurt e, lê wateyê wê ya mezin heye. Ji ber di xwezayê de her lawir bi kevilê xwe, her mirov bi çand û cilên xwe tîn nasîn. Roja 10'ê Adarê Roja Cil û Bergên Kurdî ye. Ji bo parastina cil û bergên Kurdî yê gelêrî, ev roj li başûrê Kurdistanê wekî rojê fermî tê pîrozkirin. Cil û bergên kurdî yê dirûv û şeweya xwe ji xweza û dewlemendiya zindewerîya Kurdistanê digirin û di Rojhilata Navîn û cihanê de bi reng û bedewiya xwe bala mirovan dikişînin, bi rojêkê tîn bîranîn. Ji ber bi sedsalan e bînavber hewla guherîna 'kevilê' me tê dayîn. Têvî hewldanên dagirkeran ên helandin û tinekirina çanda me, ev serdema globalbûyî jî di tîkîkirina çandên civakan de gelek jêhatî ye.

Lê li gorî Nîdaba beriya jidayîkbûna Ûttû Sûmerîyan der barê cil û bergan de ti tişt nedizanîn. Ûttû, di mîtolojiyê de wekî xwedawenda cil û bergan tê zanîn. Li gorî nivîsên Nîbada ku wekî xwedawenda wê-jeyê tê şirovekirin, Sûmerîyan hemû tiştên ji bo jiyane pêwîst ji çiya û zozanên Kurdistanê girtine. Her wiha beriya wê nezanîne cilan li ber xwe bikin, çanda cil û bergan bi çanda pêşiyên kurdan a hatina Sûmerê re dest pê kiriye.

*Min guh da dilê axê  
Behsa dildariya xwe û baranê  
bo min kir*

*Min guh da dilê avê  
Behsa evîna xwe û kaniyan bo  
min kir*

*Min guh da dilê darê  
Behsa evîna xwe û pelan kir  
Dema min guh da dilê yara xwe  
Behsa serbestiyê bo min kir*

Belê, vevê civakê wekî helbestvanê nemir Şêrko Bêkes dibêje guh da dilê xwezaya xaka xwe. Çand û erdnîgarî du tiştên bi hev ve girê-



dayî ne. Cih û devera mirov lê dijî, xwezaya wê deverê li ser hest û hizrên mirovan bi bandor e. Jixwe çand berhema hest û hizrên civakan e û ji danehevên wan ên madî û manewî pêk tê. Civaka kurd kariye guh bide dengê xwezayê û pê re li hev kirî bijî.

Bi hezar salan, me carna bi nan, carna bi agir û avê, carna bi rojê sond xwar. Me lav ji hêza afirînera xwezayê kir, carna destên xwe li ber çiyayek bilind vekir, carna jî em çûn tewafa axê. Ax dayika nan û dan bû li gel me. Av rondikên asîmanan, ji zindîyan re jiyane bû. Agirê dilê me pîrozbûn li vê xakê. Tefandina agir guneh û tawan bû. Remza ronahî û jiyane, serkeftina armanc û dozê bû agir. Dilên me bi qasî axa me, ji nebaşîyan beyar bûn û bi qasî heyva adarê dilmê û jiyanehez bûn. Rengê hest û hişê me li ser ziman û çanda me teyîsî. Carna bû deng û dengbêjî, carna bû çîrok û helbest. Carna bû tayên rengîn û li

ser teşîyan hat badan, carna bû tevî û bi rengan hat raçandin. Em bi çiya re bûn dost û heval. Hemû destanên me pala xwe dan çiyayan û çiya bûn navnişanên mirad û mexsedên me. Me her demê çar werz jiyane bi hev re. Hemû nexş û nîgarên me tijî bûn ji dîmen û wêneyên vê erdnîgarîya me ya dewlemend û zindiyên wê. Kew û kevok, xezal û kovî, quling û hemû balinde, roj, heyv û stêr, dar û daristan, çiya û keviyên berfan asoya me ya hûnerî pêk anî. Ji wê ye li welatê me yê sîngdeşt û gerdençiya çand û folklorek bi xwezayê re li hev kirî û pir rengserwer bû.

Ji ber wê Nîdaba di angaşên xwe de mafdar e. Ger em li dîrokê binêrin, wê baş bê dîtin ku yê destpêkê cil û berg, tovên pîroz, sewalvanî, bi giştî çanda madî û manewî afirandin û jê re pêşengî kirin pêşiyên me kurdan in. Ji ber kurd xwediyên resen, xwecihên vê xaka pîroz in û hemû deng û rengê xwe-

zayê li çand û folklorê xwe bar kirine. Ji vê ye folklorê kurdan bi qasî deryayekê fireh e.

Cil û bergên me ji encama pîrrengî û pîrdengiya hestên civaka me ne. Reng û teşeya xwe ji xwezaya welatê me, ji gul û kulîlkên deşt, mîrg û zozanên me girtine. Dema komek jin li cihekê tîn gel hev, tê bêjî qey şahiya rengan e. Tê bêjî qey baxekî kulîlkan, gulistan e. Şeweya çêkirina cil û bergên kurdî yê jinan mîna per û baskên balindeyan e û ew cil û bergên rengîn mirovan bi per û bask dîkin. Paşê destwerdan li vê çanda me hat kirin. Azadî û serbestî bûn xwezî û miradên helbest û çîrokên me. Bûn armancên tîkoşîn û berxwedan, serhildan û rapêrînên me. Ji bo em bikaribin vê çanda xwe bijînin bi hezaran mirov giyanên xwe kirin qurban û dilbera Feqiyê Teyran, yara hozan û helbestvanên kurd her ji wan re behsa serbestî û azadiyê kir.

Ji ber serbestî û azadî şifre û mifteyên deriyê hest û hişê vevê axê ne. Serbestî û azadî, hesta xwezî û bi nîrx e ji bo hemû zindîyan. Ti zindî ji bindestî û koletiyê hez nakin. Ti zindî ji hatina çêdêrîkirin û kontrolkirinê hez nakin. Ji wê ye di tevahiya dîroka mirovatîyê de mirovan her bal kişandîye ser firdana balindeyan û firdan bûye remz û sembola azadî û serbestiyê. Şeweya cil û bergên kurdî vevê hesta firdanê didin mirovan. Jixwe em niha roja nû, sersala kurdan Newrozê pîroz dîkin. Divê em hemû rojên salê wekî Newrozê pêşwazî bikin û qadên jiyane bi rengîniya cil û bergên xwe bixemilînin. Em çanda xwe bi rojêkê sîndar nekin. Em dikarin qîlfên li ser hest û hizrên me hatine xistin bi parastina çanda xwe bişikînin û xurtkirin û pêşxistina çanda xwe vevê hesta bedew her bijî.

Newroza we pîroz be.

Xanî 20 û çend salî bû. Hat Cizîrê. Ji aliyê Rojhilatê ve li bajêr nihêrî. Heyrî. Bi qewlê Osman Sebrî, "çavmat" ma. Pêşî ji ziman ket, dû re bi ziman ket. Di beşa 33. a Mem û Zînê da, bi devê Memî ji Dicleyê re got: "Ev şehre ye ger ji bo te mehbûb / Hasil geriyaye bo te metlûb."

Heke evîndara te ev bajar be, va ye tu gihîştî miradê xwe. Dû re dibêje: "Bêhude çira dikî tu feryad / Aware diçî diyarê Bexdad?" Yanê heke yara te Cizîr be, te bi Bexdê çî hacet?

Welatparêzî, hezkirina welêt e! Dicle gava diçe Bexdê, wê dike du seq. Dû re xwe davêje çenga Ferêt û ligel hev digîjin wê tengava ku Şeref-Xan di "Şerefname"yê (1597) da dibêje, "Kurdistan ji Tengava Hurmuzê dest pê dike." Yanê çarsed sal berê Kurdistan heya wê tengava ku îro dibêjinê Tengava Besrayê jî, diçû. Hin dîroknasên dîmokrat dibêjin Kurdistan piştî komkujîya Ermenan fireh bûye. Naxêr, Kurdistan teng bûye!

Îca ew Dicleya ji Westan, Nêrgiz, Seqan, Derwaze, Omerî û Meydanê tê digîje Cizîrê çî dike? Gava tu yarê/yara xwe dibîni çî bikî Dicle jî eynî tiştî dike, xwe davêje çenga yarê.

Ji ber vevê yekê ye ku Xanî bi devê



Mertal

Selim Temo

## Girava Evîna Kurdî: Cizîra Botan

Memî dibêje: "Daîm di dilê te da ne menzil / Destê te li gerdenê hemaîl." Hemaîl nivîst e û di stû da ye. Naxwe Dicle yara xwe dorpêç ji kiriyê. Ê ku dorpêç kiribe, naxwe Cizîr bûye girav!

Jixwe wateya Cizîrê bi Erebi, girav e. Helbet Xanî jî di tiyê. Gava hatiye Cizîrê, Cizîr girav bûye.

Jixwe gava çemek aşîqê bajarekî dibe, wî dorpêç dike û dike girav!

Ber bi dawîya beşê ve Memê sewdaser çî dibêje: "Ez Dicle me, zenberî mi berda." Bûye Dicle û hemaîl di stûyê yarê da. Her diçerxe li dor yarê.

Xanî çawa li hev aniye, ezamet e.

Gava meriv tédigîhê ku "zenberî" çî ye, wate kurtîr dibe. Zenberî, di ferhenga Adday Şer de, cureyek ji cureyê keştiyan e. Emînê Osman û Hejar Mukiryani eynî agahiyê didin. Jan Dost ji hersêyan neqil dike. Zenberî lezgintîrîn keştî ye li ser Dicleyê. Ew Xaniyê ku dixwest alaya gotina mewzûn (helbest), daçikîne li banê gerdûn, wisa mezin

e, hawar hawar!

Min di nivîsa çûyî da gotibû Melayê Cizîrî ecêb e. Qey Xanî ji xwe re ye? Ew jî wek Melê dizane ku zêde kûr e. Lê Mela bi kûrbûna xwe dipesine, Xanî jî kûrbûna xwe ditirse. Reşbîn e, dizane tenê ye, civata li dorê xwediyê ilmekî betilî ye.

Lewra di beyteka xwe da dibêje: "Metinxwanek ku nebit sahibê me'na çî bikit?" Helbet ev jî referans e bo Melê ku dibêjî: "Qabiliyet ku nebit, hikmeta ustad-i çî kit?"

Tenêti tiştêki wisa ye; tu ji xwe re li Xwedayan digeri! Xanî sê lûtke ditîn: Herîrî, Feqî û Cizîrî.




Cizîr, girav e. Cizîr girav bû. Xanî hat ber giravê û ji ziman ket. Lê yekê li giravê hebû ku Xanî dixwest bi ruhê wî Herîrî bivejîne: Melayê Cizîrî. 30-40 sal berê koç kiribû û olana helbestên wî giravê dorpêç kiribû.

Di nav olanê de ev riste ber guhê Xanî diketin: "Şevê zulmat û deryayê / Ji mewcan qet xeber nayê / Şikestî keştiya bayê / 'Ecacê wê şefeq dayê." Gelo Dicleya evîndar li dora Cizîra xwe bûbû pingareka çawa ku bahoz radibû û keştiyên bayê (sailing ship) dişikand, bi qewlê Şener Ozmenê bitrbûyî dinoqand?

Beriya hov bûn û xera bikin, Cizîr ava bû, girav bû. Zîn û Memên demê ji xwe re geşt û seyran dikirin. Xanî, Memê Alan û Zîna Zêdan kir behane û ew vejan-din. Lê Melayê di ruhê Xanî de diçûrîsî, evîndara xwe ji Zînê delaltir didit û digot ez ji ne kêmi Memî me: "Mûyekê ez ji te nadim bi dused Zîn û Şîrînan / Çî dibit ger tu hesêb kî mi bi Ferhad û Memê."

Wa Cizîra Botan, em li ber te rûreş in ku hovan, wêrekiya Mem û Zînê hevdem kirin behane û agir berî cergên te dan. Lê tu girava evîna me yî û em Dicle ne, diçelqîlin li dora te.

Leyla Nisêbînî



Van rojan em dibînin ku dinya bi şewbekê 'globalîze' dibe. Ji roja ewilî ve, her roja dibore ev şewb bi çûn û hatina di navbera welatan de pişkiya bajar û welatên nû û hê jî bi lez berbelav dibe. Giraniya sîmptomên wê kuxika zuwa, tagirtin, hilma (nefes) zehmet li gorî emr û bûnyeya mirovan diguhere. Lê tirs û xema (endîşe) nexweşiyê ketiye dilê her kesî û zêdetirî 166 welatên ku nexweşî lê belav, bûye sedema tevliheviyê. Rojên em derbas dikin, sikakên vala, dibistan û kargehên ku yek bi yek tîr girtin, mirovên ku bi tirs û guman li hev dinêrin, ne dûrî sahnayên filmekî dîstopîk in.

Xem heya astekê ji bo em jiyana xwe bikarin bidomînin, hewce ye. Divê em xemê hîs bikin da ku em bikarin xwe ji talûkeyan biparêzin. Wek mînak, gava em ajaleke kovî dibînin, tiştê di hêla ku em ji wê ajalê birevin û xwe bispêrin, xem û tirs ku dikeve dilê me ye. Ji mirovên pêşî heya niha xem di jiyana me de heye û mejiyê me xem perisandiyê. Em pêrgî tiştên ku tirsê di dilê me de çêdikin dibin, em serê xwe bi wan diêşînin û dawiyê rêbazeke ku em pê xwe ji wan xelas bikin, peyda dikin. Anku mejiyê me ji bo wê tiştê xemê û tirsê çî hewce be, wê dike. Lê ya girîng asta xemê ye. Carinan xem û tirs di dilê me de ew qasî zêde dibe ku em nikarin kar û barên xwe yê rojane bikin. Kesên weswese û xerabûna panîkê pê re heye vê pevajo nexweşiya koronayê ku em niha tê de ne, ihtîmal e ku girantir derbas bikin.

Malûm e, di dinyaya modern de û pergala em tê de, tiştê ku hînî me dikin, qencî û berjewendiyên me yê takekesî (şexsî) ne. Pergala takekesiyê, di rojên ji rêze de jî, tîra xwe dibe sedemê zehmetiyên civakî. Lê di wextê krîzên wekî vê şewba koronayê de, rê dide ku bi tirsê birçibûnê êrîş li dikanan bibin, zimhêr û qût bê kontrol bîstandin. Hêvî ew e ku di sinorên takekesî de, bi zimhêrên êdî li malê di dolaban de ne, bi dilekî şad ev bobelat derbas bibe.

Em dizanin ku dawîya menfaetên şexsî nayê. Li gorî xebateke li kovara derûnnasên Britanyayê hatiye weşandin, gava mirov dev ji şewaza fikra 'ez'ê berdide û bi şewaza 'em'ê difikire, anku nasnameyeke civakî ya hevpar bi pêş dixe, haya wan ji hev çêdibe, birxistinkirî dibin, piştgiyê didin hev û alîkariya li kesên muhtac zêde dibe. Piştvanî, xem û tirs di civakê de belavbûyî ji ber xwe ve kêr dike. Di mijara koronayê de, helwesta 'civakîkirinê' li gorî 'takekeskirinê' bêtir bersiva hewcedariyê ye. Di yekê de 'Ez ê çawa ji vê nexweşiyê bifilitim' di ya di de 'Em ê çawa bikarin vê çareser bikin' pirsên esasî ne. Gava armanc başbûna pêkve be, dê kesên herî belengaz bîstandin, xisara civakê kêr be û piştvanî dê hêviyê bide her kesî. Taliya talî, heqîqet vediguhere vê yekê; qedera civakê çî be, ew ê serê me.

Di helwesta 'civakîkirinê' de, şûstina destan an di dema kuxîne de bikaranîna destmalan girîng e. Ne tenê ji bo takekesî bi xwe, lê ji

# Bi aliyê xwe yê derûnî-civakî ve korona



bo yê derdorê jî. Lê prensîba ku vê helwestê ava dike, xwevedana rîska kesên din e. Di civakê de wezîfeyên exlaqî li me hatine bar kirin. Em dikarin xwe bixin rîskê, lê gava em kesên din dixine rîskê, ew wezîfe bînpê dibe. (Nemaze heke ew kesên belengaz bin). Ev dişibe mînak bi tenê ajotina erebeyê û bi pitikeke biçûk li piştê erebeyê de ajotina erebeyê. Ev ehemiyet tev de şewaza tevgerên me diyar dikin.

Rojên îzolasyonê de çawa derbas bibin? Em çawa aqil berne-din?

Ji bo ku pêşiya belavbûna şewbê bê girtin, pêşniyar ew e ku heta ne mecbûrî be tu kes ji malê dernekeve derve, her kes bi kêr kesan re bide û bistîne. Di vevajoyê de, kar û barên derve yan çalakîyên sosyal wê wextekê bisekinin. Ev nexweşî ne terciheke me bû miheqeq, lê ev nayê wê wateyê ku divê ev pevajo gelekî aloz derbas bibe. Ev rojên nexweşiyê, di jiyana her yekî me de dikare demeke ji jiyana ya ritma wê cuda, bê dîtin.

Di van rojan de em berê xwe dizivîrin ku derê mijara koronayê tê axaftin, nûçe bi lezgîniyê tenê weşandin, li medyaya civakî tim li ser vevajoyê parvekirin çêdibin. Hişê me gava li mijarekê asê dimîne, bi berfirehî nikare bifikire anku fonksiyonên xwe yê nixandina durist wîndî dike. Loma ya baş ew e ku nûçeyên em duçarî wan dibin, bi sinor bikin. Jixwe nexweşî belav bûye û êdî merheleya îzolasyonê ye. Qeweta me tune ye ku em mudaxleyekê lê bikin û rewşê bi temamî biguherînin. Ji ber wê, bedêla ku her serê saetekê nûçe û parvekirin bîstandin, rojê du yan sê caran lîstînin ji bo em karibin tiştê di jî bifikirin û bikin, hewce ye. Çî qas li ser me-

seleyê fikar kêr be, xem jî bi qasî wê kêr dibe.

Wekî din, di wextê krîzê de gelek spekulasyon û bi taybet di medyaya civakî de parvekirinên ku tenê dixwazin balê bikişînin, berbelav dibin. Heya gengaz be, ji spekulasyonan dîr, tenê şopandina çavkaniyên objektîf dê bihêla ku kontrola me li ser meseleyê wîndî nebe.

Wextê stres zêde dibe, wek van rojên koronayê, ya baş ew e ku em tîkiliya xwe bi hezkiriyên xwe re xurt bikin û piştgiyê bidine hev. Tîkiliyên xurt di hêlan ku mirov xwe di ewlehiyê de hîs bike.

Di pevajo îzolasyonê li malê de, dibe ku em ji hezkiriyên xwe dûr bin, ji bo ku azadiya me xera bûye em aciz bibin, nediyarî me bitirsîne, em xwe tenê û neçar hîs bikin. Helbet tu kes ne li hêviyê ye ku ew wext wekî jî rêzê ye derbas bibe, ev hemû hestên asayî ne. Lê belê di rojên îzolasyonê de, tiştên ku ji bo laşê me û derûniya me baş in, heke em paşguh bikin, dibe ku xisara wê em li ser xwe zêdetir bikin. Kêr zêde, gava em sibehan şiyar dibûn heta razanê em bi tiştînan mijûl bûn; kar, dibistan, zarok, karên malê û hwd. Di vevajoyê îzolasyonê de jî plansaziyeke ji bo hundirê malê wê bi kêrî me were. Lewra, wê dilê me rehet bike, hişê me zelal bike û wextê me watedar bike.

Divê em nehêlin wextê me tenê bi xew û xwarinê derbas bibe. Werzîş (tenduristîya laş û derûniya me girêdayî hev e), xwendin, temaşekirina filman, aktîvîyên bi zarokan re, heke derfet hebe çandî, destkariyeke nû, medîtasyon, ceribandina çêkirina xwarinê cuda û nivîsandin hin pêşniyar in. Her wiha divê hay ji xwarin û wexwarina zêde jî hebe.

## Zarok çawa dikarin bîstandin?

Em wek mezinan berpirsên helwesta xwe ya li hember zarokan in. Di pevajoyên krîzê de ya baş ku hewce ye em bikin, guhdarkirina wan û bi duristî piştgiyê wan e. Di rewşên wekî şer, karesat, koçberî, nexweşî û hwd. de çavê zarokan li dê û bavê wan e, li gorî bertekên wan ew jî bê pirsgirêk an jî traumatîk di wan pevajoyan re derbas dibin. Ji aliyê ve jî, li bertekên derdora xwe temaşekirina û hîn dibin. Berteka we ya li nûçeyan an jî axaftinên di navbera we û yê din de xwedî bandoreke xurt e ku hestên zarokan diyar dikin. Loma hewce ye mezin li ber zarokan bi tedbîr tev bigerin.

Rewşên nediyar wesweseya zarokan zêdetir dikin. Zarok tiştên ku hişê wan nagihîjîyê, bi senaryoyên herî xerab dikarin dagirin. Heke mezin mijarê biguherînin an jî ser biqevîzin an jî tiştê di li hev bînin, zarok wê stresê miheqeq wê hîs bikin. Divê zarok bizanin gava pîrsekî bikin dê bi bêhneke fireh bê bersivandin û wê karibin ser mijarê bi dê û bavê xwe re bi rehetî sohbetê bikin. Li gorî emr û zanîna wan çêdibe hûn bibêjin 'Ev nexweşî ji şewbê cuda ye, nexweşiyê nû ye. Lê her kes hewl dide nexweşî belav nebe û yê nexweşî jî tenê tedawîkirin. Di vevajoyê de ku te tiştêkî meraq kir were ji min bipirse.' Heke emrê zarokan ji 6 saliyê biçûktir be û haya wan ji mijarê tune be, hewce nake ku dê û bav wan agahdar bikin û belasebeb wan bitirsînin.

Mal ji bo zarokan cihê ewlehiyê ye. Zarok baş e ku zanibin di malê de tedbîr hatine girtin û ew tîne parastin. Lê tiştê ku dê û bav ji wan re bibêjin divê ne dîrî rastiyê bin. Wek mînak, divê nebêjin wê tu tişt bi wan neyê, li bajêr an li welêt tu kes dê bi nexweşiya koronayê

nekeve û hwd. Ev ne gotinên realist in û fêdeya wê li zarokan tune ye. Heta gava li derdorê nexweşî çêbin tîkiliya wan a baweriyê bi dê û bavê wan zirarê dibîne.

Dezenfektanên destan gelekî bi kêrî zarokan nayên. Çimkî çawa li destê xwe dixin bêyî ku hêviya wê bîstandinê ku wan jî li tiştên derdorê. Lewma hûn wan teşwîq bikin ku destê xwe bi sabûn û avê bişon çêtir e. Hûn dikarin straneke ku kêfa wan jê tê bi qasî 20 saniyeyan bistrînin da ku sebra wan li şûstina dirêj a destan bê.

Rûtîniya ji bo zarokan tiştê girîng e. Rûtîna ku bi nexweşiyê xera bûye, hûn dikarin ji nû ve çêkin. Dibistanên zarokan hatin girtin lê hûn wekî dê û bav zarokan ji xwendinê û xebata dersan dûr negirin, wê ya baş be. Ev bihevrebûna 'mejbûrî' ji bo zarokên dê û bavê wan tim dixebitîn û li derve ne, dikare bibe derfetek. Plansaziyeke rojane yan heftane li gorî emr û pêdiviyên zarokan wekî lîstîk, egzersîz, xebata dersan, pirtûk hwd. hûn çêkin û berdewam bikin dê zarok bandora neyînî ya îzolasyonê kêr hîs bikin û kêfê ji pevrebûna malbatê bigirin.

Wek encam ev dikare bê gotin; ne mimkun e ku sal bi vî rengî derbas bibin, ev rewşeke demkî ye. Hesasiyeta derûnî ya vê demê bi başî neyê kontrolkirin ihtîmal e bibe sedema destpêka hin nexweşiyên derûnî wekî bêpergaliyên xwarinê, fobî, paranoya, nexweşiyên anksiyeteyê, kesayetiya sewesî û zorlêker, depresyon û hwd. Bi van tedbîrên derûnî em nikarin pêşiya belavbûna vîrusê bigirin lê em dikarin panîka ku mezin dibe, kêr bikin û pêşiya zirarên mayînde bigirin.

### Çavkanî:

- ✓Drury J, Cocking C. Everyone for Themselves? A Comparative Study of Crowd Solidarity Among Emergency Survivors, Article in British Journal of Social Psychology 48(Pt 3):487-506, October 2008
- ✓Reicher S, Haslam S. The social identity approach in social psychology, Article The SAGE Handbook of Identities, 2010
- ✓[https://www.aacap.org/App\\_Themes/AACAP/Docs/latest\\_news/2020/Coronavirus\\_COVID19\\_Children.pdf](https://www.aacap.org/App_Themes/AACAP/Docs/latest_news/2020/Coronavirus_COVID19_Children.pdf) (dîroka lîstîkê 19.03.20)
- ✓<https://www.nytimes.com/2020/03/17/parenting/koronavirus-kids-talk.html> (dîroka lîstîkê 19.03.20)



# Piştewaniya kurewî hewce ye

Navenda Nûçeyan

Bilonçoya vîrusa koronayê her ku diçe girantir dibe. Êdî mijara sereke ya cihanê bû vîrus. Her welat ji bo pêşilgirtina vîrusê tedbirên cuda digire. Li Fransa, Îspanya, Îtalya, Belçika, Sîrbistan, başûrê Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, Tunus, Çin, Îran, Koreya Başûr û Iraqê bîrara qedexeya derketina derve hat dayîn.

Vîrus heta niha li 150 welatan belav bûye. Hejmara kesên ku bi vîrusê dikevin û an jî jiyana xwe ji dest didin saet bi saetê diguhere. Ji ber vîrusê heta niha zêdetirî 10 hezar kesî jiyana xwe ji dest da û her ku diçe hejmara kesên ku bi vîrusê dikevin jî zêdetir dibe. Ligel bilançoya giran hikûmetên dewletan her roj ji bo pêşilgirtina vîrusê paketên nû aşkera dikin. Her wiha xebatên ji bo dîtina aşiyê jî didomin.

Vîrus bi her awayî li her qada jiyana bi bandor bû. Têrkerîna xebatên zanyarî mirovan dixwe nav fikaran. Ji ber vîrusê li gelek welatan jiyana rawestiyaye. Aborî ber bi têkçûnê ve diçe. Perwerde hatine rawestandî, gelek fabriqê û kargehên mezin navber dan xebatên xwe. Her wiha derket holê ku li gelek welatan jî qelsiya xizmetên tenduristiyê derketin holê. Gelek welatan deriyên xwe yê sînor girtin.

## Li Bakur rewşeke nediyar

Ji ber politikayên ku li Tirkîyeyê tê birêvebirin ligel rewşa gelek welatan agahdar bûn jî tedbirên berfireh nehatin girtin û di encamê de kesên bi vîrusa koronayê dikevin her roj qat bi qat zêde dibin. Dema me rojnameya xwe çap kir hejmara kesên ku bi vîrusê ketin ji 191 kesan derket 359 kesan. Her wiha 5 kesan jî jiyana xwe ji dest dabû. Sazî, dezgeh û rêxistinên sîvil li gorî derfetên xwe ji gel re dibin alîkar û hişyariyên zanyarî dikin. Gelek bername û çalakiyên saziyên sîvil hatin betalkirin, koordinasyonên krîzê û maseyên krîzê hatin avakirin û daxuyaniyên "Ji malên xwe dernekevin û li xwe baldar bin!" û "Girtiyên siyasî ber-

din" hatin dayîn. Ligel ev qas geşedanan hikûmet tenê der barê aboriyê de daxuyaniyek da û ji bo teqewitiyan çend bîraran girtin. Ji bilî vî jî Wezîrê Tenduristiyê yê Tirkîyeyê Fahrettîn Koca têkildarî mijarê diyar kir ne hewce ye mirov OHAL'ê îlan bike û her ferdekê divê ji bo xwe OHAL'ê îlan bike. Her wiha ligel krîza aborî û bîkariyê bi vîrusê re gelek bûhayên tiştan hatin zêdekirin. Welatî li aliyek tenduristiyê xwe difikirin û li aliyê din jî aboriya xwe difikirin. Niha rewşeke ne diyar li Tirkîyeyê heye.

## Li Başûr qedexekirina derve

Li başûrê Kurdistanê jî gelek tedbir hatin girtin, bi taybetî qedexeya derketina derve heftaya borî hatibû dirêjkirin. Bi qedexeyê re gelek kolanên bajaran vala man. Çalakiyên giştî û bername hatin betalkirin. Wargeha Mexmûrê ligel amborgoyê li gorî derfetên xwe dest bi xebatên hişyariyê û dezenfektasyonê kirin, lê ji ber amborgoyê nikarin pêwistiya xwe yê tenduristiyê bigirin. Her wiha li Şengalê jî li dijî

vîrusê komîsyoneke hevbeş hat avakirin û dest bi xebatan kir. Komîsyon li dijî vîrusê dest bi dezenfektasyonê derdorê kir. Îsal jî ber metirsiya belavbûna vîrusê pîrozbahiyên Newrozê hatin betalkirin. Li sînor jî hin tedbir hatin girtin hemû mede tîr paqijkirin û tîr kontrolkirin. Piştî jî bo embar û bajaran re tîr şandin. Li sînor tu wesayîten barhilgir derbasî herêmê nabin û jî herêmê jî tu wesayîten naçin jî derveyî herêmê. Li gorî daneyên fermî heftaya borî li herêmê 40 kes bi vîrusê ketin û 13 nexweş jî baş bûne.

## Li Rojava tedbirên tîr girtin

Li Rojava jî ji bo vîrusê tedbirên berfireh hatin girtin. Rêxistinên tenduristiyê, rêxistinên saziyên sîvil jî bo parastina gel dest bi dezenfektasyonê derdorê kir. Li gorî daneyên fermî heta niha nexweşî nehatiye dîtin. Çalakî û bername jî hatin betalkirin. Her wiha pîrozbahiyên Newrozê jî li seranserê Rojava hatin betalkirin. Her wiha hevserokatiya Meclisa Rêveber a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê

jî ji bo pêşilgirtina vîrusê bîrara qedexeya derketina derve da. Her wiha li gorî agahiyan li Efrîn, Serêkanî û Gîrî Spî çete bi nexweşiya koronayê ketine.

## Li Rojhilatê bilonço giran dibe

Rojhilatê Kurdistanê û Îranê jî her ku diçe rewş xirabtir dibe. Di nav 24 saetan de nêzî 100 kesan jiyana xwe ji dest daye. Li Îranê jî qedexeya derketina derve hatibû dayîn. Her wiha hat diyar kirin ku dê 10 hezar girtî di nav de yê siyasî jî hene dê bîr efûkirin. Dîsa rejîma Îranê herî dawî bîrara berdana demkî ya 85 hezar mehkûmî dabû. Li gelek bajarên Rojhilatê jî rewş di xetereyê de ye. Hem di xizmetên tenduristiyê de pîrsgirêkan dijîn û hem jî agahiyên rast ji bo raya giştî re nayên parvekirin.

## Cihanê penaber jî bîr kirin

Hejmara qurbanîyên vîrusa koronayê kêlî bi kêlî zêde dibe. Di rewşeke wiha de penaberên ku hejmara wan bi milyonan kes in hatine jîbîrkirin. Herî dawî Komîseriya

Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî (UNHCR) û Ajansa Koçê ya Neteweyên Yekbûyî (IOM) ragihand ku piştî sînor jî ber şewbê hatin girtin û welatan çûn û hatin rawestandî, wan bernameyên xwe yê tîrkerîna penaberan hemû rawestandîne. Li giravên Lesbos, Chios, Samos, Leros û Kos ên Yewnanistanê 42 hezar penaber li kampên dimînin Yekitiya Doktorên Sinornas diyar kir ku ji niha ve pîrsgirêkan av, xwarin û paqijiyê li kampên rû dane û banga lezgin li Yekitiya Ewropayê kirin.

## Pêwistî bi piştewaniyê heye

Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî Antonio Guterres hişyariya ku heke li dijî pandemiyê vîrusa koronayê piştewanî nebe, di serî de welatên hejar wê jiyana bi milyonan kesan bikeve xetereyê, da. Guterres got: "Eger em rê bidin mîna şewatê vîrusê belavî herêmên herî nazik ên cihanê bibe, ev wê bi milyonan mirov bikiye. Piştewaniyê kurewî ne tenê neçariyê exlaqî, di berjewendiyê her kesê de ye."



# Dibe ku kovîd-19 bibe fetlonekeke dîrokî

Şengul Ogur

Bi vîrusa koronayê re li hemû cihanê atmosfereke nû peyda bû. Korona jî niha ve bandora xwe li ser tevahiya jiyana me dike û wilo xuya dike bandora vîrusê ya li ser jiyana me wê hêj girantir û berfirehtir be.

Korona ne ku me tenê nexweş dike, dike, me dixwe karantînayê. Korona me gav bi gav ber bi jiyaneke di ve dehf dide. Rengê jiyana me diguherîne. Bandorê li ser ekonomî, politikaya cihanî dike, bandorê li refarên civakî dike, psikolojiyê bi xwe re tîne. Bandorê li ser bawerîya bi ewle û diyarbûna dahatuya nêz û dûr dike. Psikolojiyê wiha çêbûye ku êdî weke beriya koronayê em pê ne bawer in ku sibehî em ê û an jî

nasên me wê sax bin, sibehî wê xelakeke çênebe. Korona êdî jî gelek aliyên ve ketiye nav jiyana tevahiya mirovahiyê û mohra xwe lêdide.

Dema ku mirov dêhna xwe dide rêveberîna vîrusa talokeya global mirov dikare bibêje ku rêveberîna derveletî ya li dijî koronayê li şûna kêmkirina bandorên wê, bandorên wê hêj bêhtir giran dike. Ji ber ku ev talokeya global baş nayê rêvebirin li tevahiya cihanê tirs û xofek mezin çêdibe. Ev tirs jî berê civakê bi rengekî girseyî dide malzemeyên mezaxtinê, civakê jî hemû qadên civakî, hilberandinê dîr dixwe, civakê di nav malan de hepsî dike.

Rêveberîna derveletî li pêşberî vîrusa koronayê heta niha tenê bi dilqê jandarma, polisê derket li jop e. Tenê bi qedexekirina derketina derve, bi ragihandina 'rewşa awarte'

'tevdir'an digire. Ji encamên heta niha yê nav 'tevdir'ên dewletê diyar e ku ev ne tu tevdir in û her roja ku diçe ev vîrus bêhtir berbelav dibe, bêhtir nexweş dike, dike, jiyana civakî bêhtir asteng dike û dike ku bi xwe re krîzê aborî ya cihanî bîne.

Heke rewş wiha bidome dibe ku di demeke ne pir dûr de li hemû cihanê rêjeya mezaxtinê ji ya hilberandinê zêdetir bibe û encama wê jî li tevahiya cihanê bibe xela. Encamên dîrketina ji qada hilberandinê wê jî encamên rasterast ên koronayê girantir bin. Talokeya herî mezin ev e. Ji ber ku, dema ku civak jî qada hilberandinê hate qutkirin û rêjeya mezaxtinê ji ya hilberandinê zêdetir bû, piştî demê wê zemîna teqînên civakî çêbibe.

Di rewşeke wiha de ji dewletên ku li bara koronayê tenê bi dilqê

jandarma û polîsan tevdiqerî, tenê fermana qedexeya derketina derve didin, rewşa awarte radigihînin, wê hêza xwe ji bo çewisandina teqînên nav gel bidin şixulandin, ango wê tekane îşê xwe yê ku tê de 'hoste' ne, bikin. Rewşeke wiha jî li hemû cihanê wê bi xwe re rejîmên otorîter, totalîter, dîktatorî bîne. Dema ku bi sermayedaran re fikr û fikara ku wê ewlehiya sermayeyan wan nemîne çêbû, dema ku bi desthilatdaran re fikr û fikara ku wê jî desthilatdariyê bikevin çêbû, ji bo ku sermayeyan û desthilatdariya xwe biparêzin wê dereng nemînin ku bi carekê re berê xwe bi hemû hêza xwe bidin serkutkirina civakê.

'Bersiva' dewletan a li dijî koronayê deriyê krîzê aborî ya cihanî û guherîneke radîkal a politik a cihanî vedike û helbet ev du rewşên pêkan jî bi xwe re dikarin me bi ca-


rekê re li nav şerekî cihanî bi cih bikin. Ji ber vî jî ihtîmal heye ku vîrusa kovîd-19 bibe fetloneke dîrokî.

Bêyî ku em dirêj bikin, em dikarin bibêjin, korona dibe ku bibe hinceta pêvajoya dawîlêanîna serdemekê û avakirina serdemekê nû. Heke korona bibe 'hincet'êke wiha, gelên cihanê çî qasî hazir in ku hilweşîna serdemekê û avabûna serdemekê nû di ber azadî, wekhevîyê de bi kar bînin ne diyar e. Gelên cihanê divê ihtîmaleke wiha piştguh nekin, ji ber ku berdêlên piştguhkirina ihtîmaleke wiha ji bo gelên cihanê dibe ku pir giran be.

Bila dîrok bi gelan wiha nede gotin: Dema ku em dikirin karantînayê, dema ku rewşa awarte radigihandin ji me ye ku dixwazin me ji koronayê biparêzin lê me nizanîbû ku xwe hazir dikin qira me bînin!

# Cejna hevpar a gelan

Beriya 1976'an bi piranî Newroz, di gundan de wekî serê salê dihate pîrozkirin. Kurdan Newroz kiriye wekî sembola azadî û serkeftinê. Newroz bûye cejna berxwedan û têkoşînê



Beriya her tiştî divê di sêrî de bê destnîşankirin ku Newroz ne tenê di nav kurdan de, di nav gelên din de jî wek cejn tê pîrozkirin. Di sêrî da gelên Aryen yê milê Îranê, gelên Qafqas û her wekî din, gelên din. Helbet her gel li gor çand, bawerî û civaka xwe wateyê dide cejna Newrozê. Pîrozkirina cejna Newrozê her çiqas li hemû deveran bişibe hev jî, lê her neteweyek li gor çand û baweriyên xwe pîroz dikin. Em bi kurtaşî li ser bisekinin ka gelo neteweyên din çawa cejna Newrozê pîroz dikin û bir û baweriyên wan ê li ser Newrozê çî ne.

Wekî tê zanîn, wateya newrozê New (nû) Roz (roj) ango roja nû tê pejirandin. Bi piranî jî wekî serê salê tê qebûl kirin. Gelek netewe vê rojê wekî cejna biharê bi şahî pîroz dikin. Li gorî salnameya Îranê ya ku ji aliyê şah ve hatiye pejirandin dibe sala 2569'an, li gor salnameya Zerdeshtiyê 3748'an û li gor salnameya



misilmanî dibe sala 1389'an. Li gor şiiyan Newroz roja jî dayikbûna hezretî Elî ye. Dîsa li gor baweriyaya îraniyan, Xwedê roja Newrozê, dinya û insanîyet afirandiyê. Padişahê wan ê yekemîn "Cem", cara ewil derdikeve li ser text, gel cewher diavêjine li ser û ew roj taca serê wî diçirise jî wê rojê re jî Newroz hatiye gotin.

Gelek netewe cejna Newrozê pîroz dikin, lê nêzikbûna kurdan, bi taybetî jî van salên dawîn cuda ye. Ev cudahî bingeha xwe jî mitolojiya Kawayê Hesinkar û hikumdarê zalim Dehaq hildigire. Ji ber wê jî Newroz ji bo kurdan bi wateyek din tê pêşwazîkirin. Welatparêzên kurd bi taybetî jî yê bakur cejna Newrozê wekî cejna berxwedan û tekoşînê pîroz dikin. Li gor mitolojiya Kawayê Hesinkar, tê gotin ku beriya miladê di salên 612'an de hikumdarêkî bi navê Dehaq, pir zalim bûye. Du birin li ser milên wî vebûne, wî bi mejiyê zarokên kurd ve birinên xwe derman kirine û pê aram bûye. Li wî welatê yekî bi navê Kawayê Hesinkar hebûye, heft kurên wî birine sere wan jêkirine û mejiyê wan wekî derman danine li ser birinên Dehaq. Dû re dor hatiye kurê wî yê dawîn, lê wî xwestiye êdî serî rake û dawî li vê neheqiyê bîne. Gava berdestên Dehaq tîn ku kurê wî bibin ew dibêje; "Ez ê bi destê xwe mejiyê kurê xwe pêşkêşî Dehaq bikim."

Serê ewil diçe kesên der û dorên xwe şiyar dîke ku ew jî li hemberî neheqiyê serî rakin, bi dûv re jî xwe re şûrekî taybet çêdike. Gava digihêje li ba Dehaq şûrê xwe li dewsa kurê xwe, li serê Dehaq dixê. Kawayê Hesinkar piştî ku Dehaq dike, derdikeve li ser banê serayê agireke gur vêdixê. Ji xeynê vê destanê, der barê mitolojiya "Kawayê Hesinkar" de çen versiyonên din jî hene.

Ji ber vê yeke kurdan Newroz jî xwe re kirine wekî sembola azadî û serkeftinê. Beriya salên 1976'an bi piranî Newroz, di gun-

dan de wekê serê salê dihate pîrozkirin. Hinek deveran serê salê 13'yê Rêbendanê tê pîrozkirin, lê baş tê bîra min û min jî çend kesên nas û dostan jî pirsî heman tişt gotin, li herêma Bedlîsê li gundê Çorsinê jî wekî gelê Rojhilata Navîn cejna Newrozê wekê serê salê dihate pîrozkirin. Êvara 20'ê adarê xortekî dibû kalo, yek dibû pîrê û yek jî dibû deve. Mal û mal digeriyan, rûn, savar û hêk bi van gotinan berhev dikirin.

-Alîlok, alîlok navê kurê we çî ye?

-Navê kurê me Egît e. (Mînak)

-Xwedê bihêle

-Xwedê mal û jin bike

Xwedê keç û kur bike

Tewle tijî ga û gamêş bike

Govê tijî pez bike

Serê salê binê salê.

Xwedê bihêle malxwîyê malê

kebanîya çengzêrinê Rabe bine kî-vîya rûnê...

Li hinek gundan jî weha di-hate gotin.

Dolî dolî da kin

Serê kuran rakin

Serê keçan dakin

Govê tijî pez kin

Tewlê tijî ga kin

Serê malê binê malê Xwedê

bihêle kurkê malê.

(Mixabin kurdên me jî wekî gelên dinyayê jî ber pergala desthilatdar serê kuran rakirine, serê keçan dakirine.)

Bi vî awayî xortên gund tev li cihêkî dicivayan savarê bi navê "maşkule" dipehtin, li her malên gundiyan tevsîyek dişandin. Piştî savar dixwarin, agirekî gur vêdixistin li dora wî agirî stranên sivik digotin û guvend digerandin. Hinek kesan jî xwe di ser agir re diavêtin ku guncê wan dawêşe nav êgir. Dotira rojê jinan kincên xwe yê xweşik li xwe dikirin, xwarinên taybet dipehtin. Ew roj wekê cejn dihate pîrozkirin. Lê piştî salên 1976'an serê ewil ci-

wan lastikên erebeyan dibirine li serê çiyayan agir berdidan wan, ew agir heya sibê vêdikekin, çend sal şûn de Newroz di qadên bajarên de tê pîrozkirin. Jinên kurd jî rola xwe pir baş dilîzin bi cil û bergên xwe yê gelêrî ve qadên Newrozê reng û reng dixemilînin. Mêr û jin bi cergobezî govend digerin.

Kurdên Başûr û Rojava jî salên berî şeva beriya Newrozê, li her taxê û li her gundi agir vêdixistin, li ber muzikê dora agir bi cergobezî govend dikişandin û xwe di ser agir re diavêtin. Roja Newrozê, diçûne seyrangehê heya êvarê bi coş cejna Newrozê pîroz dikirin. Lê van salên dawî her çiqas biçin seyrangehê ew jî êdî li qadên bajarên Newrozê pîroz dikin.

**Çavkanî: Nivîsa civaknas Husey Bal a li ser internetê**

## Li Ozbekistanê şitlên daran diçînin

Li Ozbekistanê, hefteyek beriya amadakariya Newrozê tê kirin. Hemû kes nav mala xwe, baxçeyên xwe û taxa xwe paqij dikin. Şitlê daran diçînin. Derheqê Newrozê de nivîs dinivîsin û bi pencereyên xwe ve dialiqînin. Ji ber ku Newroz wek cejn tê pîrozkirin, ew roj kesên ji hev xeydandine li hev tîn, serlêdana pîr, kal û nexweşan tê kirin. Zarokên ew roj diwelidin, eger keç be navê wan datînin Newroza yan Baharay, eger kur be navê wan datînin Newroz an Bahar. Ev roj xwarinên taybet ên Newrozê tê pehtin. Danê êvarê li her taxê agir tê vêxistin, xwe li ser agir diavêjin, li gor baweriyaya wan agir guncê hên wan tev de paqij dîke. Roja Newrozê diçûne seyranê li ber muzikê dans dikin û gelek lîstikên din dilîzin.



Ahmed Kani

ahmedkani21@gmail.com

## Newroz û destpêk

Newroz, di jiyana neteweya kurd da wek tēgeh, cejn û efsane xwedî cihêkî girîng e. Li ser bē-jeya Newrozê gelek lēkolîn hatine kirin. Wek mînak di sala 2014ê da, pirtūkek Faysal DAGLI bi navê "Kutsal Kitaplar ve Mitolojide Kürdler/Kurd di Pirtūkên Pîroz û Mitolojîyê da" jî Weşanên Aramê derçû. Beşa yekem a vê pirtūkê li ser Newrozê bû û wek gotar di malpera bi sê zimanan (kurdî, tirkî û inglîzî) dirokakurdistan.comê da weşîya. Dîsa li ser mijarê Prof. A. ADAK bi navê "Newroz ji Perspektîfa Edebiyata Kurdî ya Klasîk" di Basnewsê da, sala 2016ê gotarek îlmî weşandibû. Ez jî dixwazim li ser tēkiliya Newrozê bi destpêka kar, bûyer, azadî û riz-gariyê ra rawestim. Em karin Mem û Zîna Ehmedê Xanî ku du beşên xwe yê jî 42 malikan pêkhatî bo vegotina cejna Newrozê veçetandîye bikin mînaka destpêka hevnasîna keç û kuran. (DOST: 2010, 197)

Ji ber ragihandina otonomîya 11ê Adara 1970yî (deh roj berî newrozê bû) li başûrê Kurdistanê ku bû sedema geşbûna hestên neteweyî yê kurdan û bihêzbûna tevgera ciwanên tirk ên çepgir ku li ber bayê nîfşên 68an ên cihanî ketibûn, rewşa awarte ya 12ê Adarê li Tirkîyeyê û bakurê Kurdistanê hatibû ragihandin. Partî û Komeleyên Kulturê yê Rojhilat Şoreşger (DDKO) hatin girtin û hemû rêveber û kurdperwer avêtibûn zindanê. Bi efûya giştî ya sala 1974ê şoreşger û kurdperwerên ku jî zindanan derketin tekoşîna xwe bi awayekî xurttir meşandin. Ji sala 1974an heta 1980yî şeş sal li ser hav gelek xebatên ziman, wêje, çand û hunera kurdî hatin kirin.

Berî her tiştî ez wek ciwanek kurd ê ku diçû pola duyem a lîseyê, di sala 1976ê da bi derketina kovara Rizgarîyê ku berpirsiyarê wê Mehemed Uzun û xwediyê wê Rûşen Arslan bû, ra li ser efsane û tēgîha Newrozê bûm xwedî agahî. Meriv kare bibêje ku cara ewil di Newroza 1976ê da kovarek bi kurdî û tirkî li bakurê Kurdistanê derdike. Vê kovare jî Newrozê wek destpêka gelek tiştên heja dinirxand û derketina xwe ya di Newrozê da jî bi zanî hilbijartibû. Di van salan da li bakurê Kurdistanê agirê Newrozê geş bûbû. Lê dewleta dagirker a tirkan li hember vê pêla şoreşger a ku hemû kurdan bi hev ra pêk anî bû, rawestîya. Di parlamentoya tirkan da, Silêman Demirel, kovara bi kurdî (Rizgarî) li ser parlamentaran dihejand û digot ewrê reş ê dabeşkar li ser Tirkîyeyê digerin. Bi vî awayî eniyek nejadperest li hember kurdan ava kir. Artêşa tirkan jî bi awayekî veşarî cih û zemîna darbeya (kudeta) leşkerî amade kir û di 12ê Îlona 1980yan da dest danî ser rêveberîya Tirkîye û bakurê Kurdistanê. Li hember kurdperweran zindana 5 nolû hat avakirin. Bi hêviya ku dê mafê kurdan jî holê rabikin wehşetek nedîtî meşandin. Lê tu carî kes nikare mafê rewya yê kurdan jî holê rake.

Serê dewletên dagirker (Îran-Iraq) li ser axa kurdan didomîya, 16ê Adara (5 roj berî Newrozê) 1988ê Helebçe, bi çekên kîmyewî hat bombekirin. Jenosayda li ser kurdan bi milyonan kurdên rizgarîxwaz şehîd kir, lê nikarî pêşî li statugirtina kurdan a li ser beşek axa kurdan di Newroza 1991î da bigire. Di dema ku dewleta tirk nedixwest pêşiya weşana televîzyonê bi zimanê kurdî veke da, televîzyona kurdan li ser satelaytê bi kurdî dest bi weşanê kir. Li Bakurê welêt, bi taybetî jî li Amedê beşdariya pîrozbahîya Newrozê ya girseyî (ji milyonek zêdetir) ye. Lê mixabin jiber belavbûna vîrusa koronayê ya cihanî dê isal hemû pîrozbahî bêne rawestandin.

Îro li du beşên Kurdistanê (Başûr û Rojava) bi milyonan zarokên kurdan bi zimanê xwe perwerdeyê dibînin. Li dibistanan dersên ziman, wêje, dirok, çand û hunera kurdî dest pê kiriye. Ez jî bi pîrozkirina Newroza xwendevanên rojnameya xwebûnê, dest bi nivîsên xwe yê di rojnameya Xwebûnê da, dikim.

## Pîrozbahiyên li Îranê

Li Îranê, amadekariya Newrozê 15 roj berê dest pê dîke. Malên xwe pak dikin. Li ser tebxarçeyan genim û nîsk direşînin. Çarşema dawî danê êvarê li kolanan agir tê vêxistin, xwe li ser agir hildavêjin. Li ber defa Hacî Firuz direqîsin, çerez dixwin. Ji êvarê da heft heb tiamê bi tîpa "s" yê dest pê dîke û masî dipêjin. Hêk dikelînin reng û reng boyax dikin. Dotira rojê sala kevin diqede û sala nû dest pê dîke, sibê zû malbat tev cejna hevdu pîroz dikin. Mirovên mezin diyarî didin biçûkan. Serdana goristanên xwe dikin, diçûne serdana nexweşên xwe. Bi dûv re hemû bi hev re diçûne seyrangehê. Li wir xwarin tê xwarin cure, cure listîk tîn listîn.

## Li Afganistanê çil roj dikişîne

Li Afganistanê Newroz çil roj dikişîne, hem wek cejna olî û hem wek cejna neteweyî tê pejirandin. Li gor baweriyaya wan ew roj çavên koran vedibe û nexweş tev qenc dibin. Mihricana gulên sor çêdibe, hesp dibezînin, guştîlî digirin, jin, mêr, zarok kincên xwe yê gelêrî li xwe dikin li ber def û zirneyê stranên dibêjin û direqîsin. Şeva beriya Newrozê jin komê cihêkî dibin bi stranên Newrozê ve xwarineke bi navê "semelek" çêdikin. Roja Newrozê mêr di malê de dimînin karê malê dikin jin derdikevin seyranê. Di nav vî çil rojî de her çarşem jî bo jinê rojke taybet e.

## Ji serê adarê heta dawîya adarê

Li Azerbeycanê pîrozbahîya Newrozê jî serê adarê dest pê dîke heya dawîya adarê. Çar çarşem çar element bi hev ve tîn honandin û di heman demê de ev çar element bi hebûna mirovahiyê ve jî tê girêdan.

Çarşema ewil a avê ye, ew roj merasîma avê dikin û li gor baweriyaya wan, nexweşiyên wan tev qenc dibin. Çarşema duyemîn a roj û agir e, gel jî bo ronahî û germahiya rojê şahî li dar dixin. Çarşema sêyemîn a

bayê ye, tê gotin ku ba li dinyayê digere, av û agir şiyar dîke. Çarşema çaremîn a axê ye, ev roj ax şiyar dibe, hewa germ dibe, dirêjiya şev û rojê dibe wek hev. Vê rojê wekî cejna serê salê bi şahî pîroz dikin.

# Newroz

## Pîroz Be

Newroz remza berxwedan û vejînê, agirê serhildana lidijderketina qurbanîkirina ciwanan e ku di kesayeta Kawayê Hesinkar de şênber bû; li dijî mêtîngerî û zordariyê ya di şexsê Dehaq de berteka li hemberî hişmendiya serwer e.

Bi van hest û daxwazan em Newroza hemû gelên Rojhilata Navîn û bi taybetî ya neteweya kurd pîroz dikin; aştî û biratiyê ji tevahiya cîhanê re dixwazin.

Newroz pîroz be...

**Hevşaredarên  
Êlihê û Endamên  
Meclisê**

# Newroz

## Pîroz Be

Em bawer dîkin, ew ê agirê  
Newrozê her tim ji bo têkoşîna  
demokrasî û azadiyê vêkeve û li  
hemû Rojhilata Navîn bibe  
wesîleya azadî, biratî û  
wekheviyê. Bi vê daxwaz û  
hêviyê em cejna Newroza gelê  
xwe û ya hemû gelan  
pîroz dîkin.



**Hevşaredarên  
Sêrtê û Endamên  
Meclisê**

# Zimistan ra dima tim usar o

Cemrey ewîlî hawa û awe û bado gineno hard ra. Welê hardî sey zerre maya însanî yo. Her estbîyayê wayîr bîyayana xo vejîno û sey cemranê usarî yo

Mehmet Seyitalioglu

Cemrey ewîlî hawa û awe û bado gineno hard ra. Welê hardî sey zerre maya însanî yo. Tede zafçî bene kewê. Zil dano pede. Vejîne rîye hardî. Serre ke wet, xo şaneno toxim. Yakî gul û wila de xo xêmelnenno. No xê-melnayîş sey laser gineno were û vêr kes nevindeno. Her der û derxurî de xo şemernen we, dinyayede bîne xore keno şên.

No ware hayatê de nêwo, çiyede bîno. Mar û milawun, kesa û dilpîştik, têyr û qilancike, leyleg û luye, dimega û tîrşîkê, envayî tûr, kutik û pisinge, meşîn û bîzî û swî. Peyro piya des û heyşt hazrî muxulkat naçî ra peyda beno. Heyatê xo rameno. Her estbîyayê wayîr bîyayana xo vejîno û sey cemranê usarî yo.

“Nawo usar amo, yâre ceno şono... wengê xo kî wêş o. Kes ma re tomet mekero. Dêrdê Dersim ma re yâre ra meras mendo. Yare suare wanena zerre ma wesnena.” Koma şare ma rewşa heyatê xo zafderdî dîye. Çend hazarî serra bine bandora kolanîstade bîyo. Hona keno dewam. Xoserîya zonê ma verde çî est o? E Juyene; zonê xo ma kerd vîndî. Naye qêy vano; Sujo guna ma çîka? Nika ma ra êna perskerdene. Ma çî nîyard ca. Zonê xo re çê xode, der û cîrana mîyande wayîr nê-bime. Ne wend, ne nivîsna. E



Diyîne; koç berîye ma kerdîme xan û xirabê. Adet û torêma, îtîkatê xo xode neberd koçberîyede ne ciwîyayme. Harde xo ra kewtîme dûrî. Îtîqat hardo Dewrêş de mend. E Hîreyîne; qe-dexê dewlet ma xo mîyande qubul kerd, sere ci re naro. Ma vat ‘tîrkî bimuse xo raxêlesne’. Ebe no keyde kî asimîlasyon re çêberê çê xo ma bi xo hetanî peynîye kerd ya. “Zerence wa-

nena, Dêrsim têy berbeno, kes naye ma rê tomete mekero” gele embaz û hogira. Zaf çî ma wahî newêjyay ime.

Ebe berbîş û ebe moral pozxunîye neresênîme caye. Barbîş û huyayîş wucude însano de merkeze xo aynî cade ro û juyanê. Takêşe jubînîyê. Ne vate sero sere namey nuştê xo “Zimistan Ra Dima Tim Usar O” napa.

Şare ma dest bido jubînî piya ho kîme. Koyan erzênîme pey xo. Qêt çîye ma werde damîş nebena. Ewulî seba estbî-yayêna xo. Zonê ma kamiya ma wa. Bîniwîsn îme, biwan îme, bidîme qêse kerdene. Welatê xo ra wayîr vejîme. Çar koşê welatî awa bikîme. Yacer îme welatê xo. Dewa û sûkanê xo awa bikîme. Ebe fikro vate û karede nêwe dest bi kar û gure xokîme.

# Mesela heşî û apê Farizî

Turabi Kişin

Apo Fariz şono verê korekî. Şono qayt keno ke heş hanîko luye fetelnenno. Tabî luye yamanana fend û firildoqê xo zafê. Vaz dana şona urtê di daranê tengan de vêrena ra, heş çî dime şono wexto ke mabênê î daran ra vêreno ra tey şidîno û maneno.

Şidîno, heş tenge de ro, waka luye dormê heşî de êna şona, çüyê xo gêna peyra ra dana haşa qîna heşî û vana “Bîrawo hirç çilç û vilç, çilç û vilç”

Luye pê xo şa bena, qaytê dormê xo kena remlan dana xo. Heş tenge de ro. Dest ra tawa nêno.

Apo Fariz çî durî vindeto piro sêr keno.

Luye heşî pîrişan kena û aye ra dime dana raye şona. Heşî ra durî kuna.

Neyse heş xo ano nat beno dot welhasilî xo xelesneno ra.

Eke xo xelesneno ra dano raye şono hetê Apê Farizî.

Vano “Apo Fariz nêbo nêbo to na filaketa ke ewro amê mi ser naye cayê qesî bikê, vacê luye heşî ro nîya nîya kerd. To naye cayê qesî bikê şerefê mi ana panc perî. Ez tora rica kena

ke to cayê qalê na mesala meke.”

Apo Fariz vano “torê soz ez kesi ra nêvana. To zerê xo rehet bige.”

Apo Fariz korekê xo awe dano û şande dano raye şono kê xo.

Şono kê ama heş bawerîya xo be Apê Farizî nîyano. Dano raye şono serê banê Apê Farizî de goşê xo dano serê locine û vindeno.

Kê Apê Farizî de domanî zafê. Nêvîndenê. Apo Fariz rê vano qiçêne vindê, didi vano vindê kes goş nêkûno Apê Farizî ra.

Qayt keno ke fayde çîno

qîcan ra vano “bêrê ronîşê ez şima rê jû meselê qesî bikî.”

Qicî cade ebe kêf û meraq dormê Apê Farizî de kom benê û ver ra kaytê fekê Apê Farizî kenê.

Apo Fariz vano “ez ewro şîya verê korekî, mi di heş hanîko dima luye û luye fetelnenno. Luye şeytana wayîrê fend û firildoqana, remê şîye mabênê di daranê tengan de vêrde ra. Heş dima luye şî kewt mabênê î di daranê tengan û nêşkiya vecîyo tey şidiya mend. Luya cazûye çüyê xo girot şîye pêynîya heşî û çû ra da qîna heşî û va ‘bîrawo hirç çilç û vilç, çilç û vilç.’

Wexto ke Apo Fariz nîya

vano qicî kenê tiqe tiqe û hûnê. Heş serê banî yo. Goş dano ser. Zaf zorê î ra şono.

Heş daymiş nêbeno corde locine de sarê xo derg keno û vano “Apo Fariz, to meşte êna garis, ez o wexto to kena di tir û di fis.”

Beno şodir Apo Fariz dano raye şono hêgayê garisî ke çî şoro, heşî xo mabênê garisî de gevzî do. Garis pêro pan kerdo. Teyê cayan de garis kerdo we. Hêga xirabe kerdo.

Heş durî vindeno û Apê Farizî ra vano “to soz da mi sozê xo de nêvîndeta, to rê derse bo ke to rê de bin sozê xo de cayî nêbê, sozê xo de vindê.”



Dewey Ma



Cemil Oguz

cemilo@diyamame.com

## Aşmêke keye de ma go se bikerê?

**Çîke eşkere est o:** Her des seran reyke (belkî 5, belkî 15), ma vacin des seran reyke nêweşîke pîle dinyaya de vecêna. Wexto vecêna beşko bi kamî xodir bena û şina. Enka zî nêweşîya korona (Covid-19) veciya wa.

Verî Çîn de veciya û dima ra xo ro welatanê bînan girê da. Enka bi awayke fermî Tîrkîya de wa. Û Tîrkîya zî bîyarê newey girota. Gorey bîyaran ra cafe, AVM hamey girotişî, festîvalî hamey betalkerdîşî. Zehf tera şar nêşino kar û keye de wo. Û vanê “Heta mimkûn bo keye xo ra meveciyê.” Eno “meveciyayîş” go çende rocî, ya zî çende aşmî dewam bikero, diyar nîyo. La ma vacin aşmêke...

Temam, ma nêveciyê, la ma go keye de se bikerê? Bêrê ma serê henî pêşniyaran de vînderê ka ma eşkenê se bikerê:

### Dersa kurdî

\* Her keye de înternet esto. Ma eşkenê serê înternetî ra serê zîwanî de bixebitîyê. Ma eşkenê kirmanckî/kurmanckî xo baş bikerê. Ê ke serê zîwanê xerîbî de xebatênê eşkenê dersanê xo dewam bikerê.

### Fîlm-belgefîlm

\* Her fîlm û belgefîlm dinyayêke newî, dinyawa haya ma te ra çîniya mocneno ra. Ma verê xo bidê înan. Fîlm û belgefîlmên kurdan ê bi kurdî zî estê. Ma eşkenê înan serê youtube/vimeo û malperanê bînan ra peyda bikerê û temaşe bikerê.

### Rojname-kovar

\* Rojnamey Xwebûn, kovarê bîne bi kurdî şima eşkenê peyda bikerê û biwanê.

### \*Kitabî

\* Kitabî... Kê heminan de kitabî estê, yê ke hamey wendişî û yê ke niyamey wendişî. Heme hîvey şima yê. Kitabê newey estê, merdim eşkeno pirtûkfiroşan ra biwazo û biwano.

### Wext qeybî tûtan

\* Yê ke semedê karî heta enka nêşkayne tûtanê xo dir wext derbas bikerê, eşkenê wextê xo tûtanê xo dir baş saz bikerê. Mekerê xo vir ke tûtî bîngêhê jîyaney xo dadî û babî ra gêne. Ma çî bidê înan, yê çî gêne û jîyaney înan gorey a joy ra şîkil gêna. Enka zî, wexto bîn zî çîqa derfetê şima virazîyay wextê xo tûtanê xodir derbas bikerê.

### Qalkerdîşê hikayan

\* Wendiş zî, qalkerdîşê hikayan zî qeybî hafîzey tûtan muhîm a. Ma tûtanê xo, hevalanê xo rê qalê hikayan bikerê. Hikayey şima zanê, ya zî şima verî şînanwî bî, şima eşkenê bîyarê xo vîr û qeybî tûtanê xo qal bikerê. Qeybî hevalanê xo qal bikerê û ana dem derbas bikerê.

### Kay

\* Tûtîti ma de kay ma zehfî bî. Kay zey “newberg”e, “heftok”e, “Dame”, “Stranc” ê ke enka hamey mi vîrî. Zehmet nîyo, keye de merdim eşkeno enîyan vîrazo û kay bikero.

**Û vatişo peynî:** Her çîqa vanê keye ra maveciyê zî pêşniyarê mi eno wo ke şima veciyê teber. Erê, meşorê caw zehf qelebalix, la şima eşkenê şorê parkan, hewayke pak bigirê, henî peyase bikerê û ageyrê. Ke mesela keye de mendîş bo, xeynî enî çî ma niştî, şima zî eşkenê çîyanê bînan, neweyan bîvinê û wexto xo baş derbas bikerê. Bî hêviyo ke go ene nêweşî nêşko bi ma...

MiGo



Şûjin

Dildarê Amedê

Korona û gîska pîrê

Berê mezinên me digotin xwedê mirov bistrîne ji tiştên ku mirov hay jê tune ye, lê me tu wate nedida vê gotinê. Niha piştî belavbûna vê mîrata koronayê îca bêtir min fêhm kir ku wan çi digot û ew gotin hate bîra min.

Bi rastî jî tiştên ku mirov hay ji wan tune ye zehmetir in, ji ber ku tu nikarî ne xwe ji ber bidî alî, ne jî texmîn bikî kengî, çawa û li ku dê derkeve pêşberî te. Di nav keftelefta belavbûna vê şewba koronayê û metirsiyên xelkê de gelek tiştên ecêb jî derdikevin holê.

Îca ev tirs û sawa koronayê ne bes bû û me bawer nedikir ku sermaya zivistanê xelas bibe, em ketin rojên gîska pîrê. Li gorî dibêjin di van rojên adarê de ku tav derketiye pîrekê çend gîskên xwe dibe da ku biçêrîne, xweza lê hatiye xezebê û 7 rojan baran û bahoz lê rakiriye.

Ev serma û baran jî tev sûcê pîrê û gîskên wê ne. De xwedê ji te re razî tu yê çima gîskên xwe derxîni çêrê û heta bi hetayê em ê derdê te bikişînin. Lê de hema pîrê jî gîskên xwe derxistin çêrê ma wê dinya xera bûbûna ku gîskên wê hinekî giya xwaribûna. Xezeba xwezayê jî xezeb e ha xwedê mirov jê bistrîne.

Lê tev li aliyekî derdê wê mîrata koronayê li aliyekî. Bênavber nûçeyên mirina mirovan tîne weşandin û her ku diçe hejmar zêde dibe û cihan tev daye ber xwe. Îca her gelek li gorî xwe û zanyariyên xwe û medyaya xwe serî li hin rêbazan didin da ku xwe ji vê vîrusa kujer biparêzin.

Wekî mînak li Îranê ji ber ku digotin alkol wê vîrusê bikuje, keysparêzan jî ev yek ji xwe re bi kar anî û bi alkola sexte zêdeyî 20 kesan jiyana xwe ji dest da. Her wiha beriya çend rojan min bihîst ku li Êlihê jî mirovekî çûye şûşeya kolonyayê bi ser serê xwe da kiriye û vexwariye. Di encamê de ji ser hişê xwe ve çûye û ew avêtine nexweşxaneyê.

Îca tîrsa ji koronayê ne bes bû, hin oldar derdikevin û vê yekê wekî elametên dawîya dinyayê dinirxînin û senaryoyên ecêb rêz dikin. Yek dibêje dermanê koronayê di nav quranê de veşartî ye li navê bigerin hûn ê mûyekî pîroz bibînin wî mûyî bixin nav avê û vexwin hûn ê rihet bibin. Hinek jî bi rastî li nav digerin û bi rastî jî mû dibînin lê heyra ma kesek ji we nafi-kire ku bêguman dê mûyên mijank an jî birûyên we di nav de hebin. Ji ber dema mirov dixwîne dibe mûyek ji mijank an jî birhê mirov biweşe nav. Hinek jî senaryoyên ecêbtir dibêjin û wekî ku dawîya dinyayê hatibe dibêjin nizanîm di Kîjan rojê de dê nizanîm çi bi ser gerestêrka dinyayê de bikeve û dê rojê di ji rojava derkeve.

Bi rastî jî gelek senaryoyên wiha belav dibin ku encax xeyala derhênerên Hollywoodê bikaribe ji wan sût werbigire. Xwedê mirov bistrîne û vê vîrusa xedar zû ji holê rake hindik maye xelk ji tîrsa wê û rewşa awarte malên xwe bikin super market.

Lê henek li aliyekî divê mirov bi rastî jî hemû tevdirên xwe bistîne li paqijiyê miqatebe, zêde tev li civat û hofikan nebe, bênavber destê xwe bi sabûn û avê bişo, dema mirov pişkiya li derdorê belav neke, her 15-20 deqeyan avê vexwe û li xwarin û vexwarina xwe jî miqatebe ji bo korona nikaribe bi me. Bi hêviya ku di demeke kurt de ev mîrat çareser bibe û bi mehan dirêj neke...!

# Ez çi bikim bi vî kaxizî?

Zilam nexweş dikeve û diçe nexweşxaneyê.

**Bijîşk dibêje:** Ku derê te diêşe?

**Zilam:** Doxtor beg ez nexweş im.

**Bijîşk:** Ez dizanim tu nexweş î. Heke tu nexweş nebûnayî çi karê te li vê qulqurt-xanê heye? Lê divê ku derê te diêşe tu ji min re bibêjî. Ya na ez ji ku dizanim ku derê te diêşe.

**Zilam dibêje:** Doxtor beg bi wê qurana te xwendiyê halê min tune ye.

**Bijîşk:** Bi wê qurana te jî xwendiyê ez dizanim tu nexweş î lê ez nizanîm ku derê te diêşe.

Û dibêje de kanê cilên xwe derxe ez binihêrim kanê ev nexweşî di ku dera te de ye.

Zilam cilên xwe derdixe û xwe li ser sedrê dirêj dike. Bijîşk destê xwe dide ser zikê wî û dibêje: Ev der diêşe?

**Zilam:** Na. Ne ew der e.

Bijîşk destê xwe dide ser sînga wî û dibêje: Ev der diêşe?

**Zilam:** A welahî te bi devê birîne girt.

**Bijîşk:** Wey mala xwedê ava be, me pê derxist û dibêje: De rabe cilên xwe li xwe bike.

Di vê navberê de bijîşk ji nexweş re reçetê dinivise û dide destê wî, dibêje here dermanxaneyê, dermanê xwe bikire û here mala xwe.

Zilam dertê derve û car din dizivire tê cem bijîşk.

**Dibêje:** Doxtor beg ez bi vî kaxizî çi bikim?

**Bijîşk :** Tu yê vî kaxizî bibî dermanxaneyê û wê dermanên te bidin te, tu yê van dermanan bixwî an jî vexwî û tu yê baş bibî.

Zilam dertê derve lê tu tiştêkî fêhm nekiriye û car din dizivire û diçe cem bijîşk, ji bijîşk re dibêje: Doxtor beg ez di bextê te de me. Tu xwe acis nekî lê bi merqeda hezanê min ji vî kaxizî tu tiştêkî fêhm nekir. De kanê ji kerema xwe re car din ji min re


bibêje. Bijîşk dike ku biteqe. Dibêje, tu yê vî kaxizî bibî û herî malê. Tu yê vî kaxizî bikî beroşê û bidî ser agir bila têr û tîjî bikele û tu yê vê ava kelandî bi carekê bi serê xwe da bikî û yekser vexwî. Belkî nava te biperite û em ji hev xelas bibin û dibêje îca te fêhm kir an na?

**Zilam :** Erê erê min fêhm kir. Ez ewqas jî ne ker im lo!

Riza Uyar



## XAÇEPIRS



### JÎ ÇEPÊ BER BI RASTÊ

3. Qumaşê bêhtir jin li serê xwe girê didin.
5. Kesê/a hêmin, bêdeng.
7. Cihê ben bi hev ve dibin.
8. Gihayekî biharê çêdibe û tê xwarin.
9. Ew ên ji kiryar û gotinên xwe poşman.
13. Dirûv, şekil.
14. Dikeve şûna cihê navên nediyar, çik.
16. Alaveke şer, ji hesin çêbûye.
19. Sewalek kedikîrî.
20. Wesleyê jî qolincê heta dest, mil.
21. Êş, fikar.
22. Beşên di nav civakê de, wek karker û dewlemendan û hwd.
25. Pêşgira lêkerçêker.
26. Amûra derî pê tê vekirin û girtin.
28. Cihê kevîr lê tune bin.

### JÎ JOR BER BI JÊR

1. Di dadgehê de rûniştina ji bo dari-zandinê.
2. Ceza.
3. Baş, bedew.
4. Nîşaneyên dangan (a,b,c,ç...)
6. Kar û barên pêk hatine yan jî dê pêk werin, plankirin, nirxandin.
10. Cînavka kesê/a sêyemîn ê/a nêz.
11. Amaje, îşaret, marka.
12. Ale-veke çandiniyê ye, dişibe bêrê.
15. Ajalek jîr e û çarpê ye.
17. Sewalek kedikîrî.
18. Cure.
20. Beşek bedena mirovan a ji nav mil heta kulîmekan.
23. Zayenda berevajiyê mê.
24. Gihayekî li erdên şilek şîn dibe û selik pê tîne çêkîrin.
27. Cînavka nîşandanê ya nêz.

### Bersiva hefteya borî



# Strana Zekiyyeyê



Zekiye Alkan ji min xwest ku strana Eyaz Yûsif a bi navê Newroz bibêjim. Piştî min fêhm kir bê ka ji bo çi dixwaze ez vê stranê bistrêm

NEWROZ

Çavkani û Stranbê: Eyaz YÛSÛF (ZAXOYÎ) Notanvî: Serhac VARLÎ

New roz hat û li gul û ri  
han... rej na me ya li bîst û ye kê Amûr-  
ew new ro za bû ka ci... wan... a gi ri hil kin  
se re... kê (Amûr-...) kê (Amûr-...)  
yad gar... e ji bab û ba pi... ra... wan si kan di... qey  
dîzûn ci... ra... der, bi rîn roj hi... li ta me...  
de ra bin hil kin... ra (Amûr-...) ra (Amûr-...)

**Newroz**  
Newroz hat û bi gul û rihan,  
Cejna me ya li bîst û êkê (yekê),  
Ew Newroza bîka ciwan,  
Agiri hilkin serê rêkê,  
Yadgar e ji bab û bapîran,  
Wan şikandî qeyda zincîra,  
Derkirin rojhilata min,  
Dê rabin hilkin xetîran,

Newroz hat û roja nî ye,  
Rengê gula xemilandî ye,  
Hemî wara dilan rabîn,  
Tevda aheng û hêvî ye,  
Van celala av lê bûşe,  
Seyran li van mila xur e,  
Kar û rewîştî me Kurda,  
Cejna Newroz mendehoş e,

Newroz hat û roja mêra,  
Milet xurî wekî şêra,  
Ruxandin duşki neyara,  
Dilê m' bi ala dilêra,  
Newrozê hey lê lê Newroz,  
Tu roja mêrê xudansoz,  
E minî beşpijêkê geş,  
Bû me Kurdan cejneke pîroz,



### Veysi Varli

Di dîrokê de hikûmdarê kurd dil têt girtin û hikûmdarê ku ew dil girtiye dibêje: **“Heke tu ji min re koletiyê bikî ez ê te bibexşînim, heke tu pê neyê ser daxwaza xwe ya paşîn ji min re bêje ez ê pêk bînim û piştî jî ez ê te serjê bikim.”** Piştî vê gotinê hikûmdarê kurd dibêje; **“Here ji zozanê min şivanekî bîne.”** Li ser vê gotinê hikûmdar matmayî dimîne û dibêje; **“Tu yê çi bikî bi şivan?”** Yê kurd dibersivîne û dibê; **“Guhdarkirina yek serhaweyek ji zozanê axa min, çêtir e ji jiyana sedsalî ya koletiya min.”**

Cejn navê sembola nûzayîn û destpêkirinê ye. Sembola yekitiya çanda gelan, aşî û şadiyê ye. Ji bo şadî û aşiyê bedelên gelek giranbuha hatine dayîn. Ji bo nixrên mirovahiyê li hemberî zilm û paşverûtiyê gelek serhildanên bi heybet li Rojhilata Navîn pêk hatine û ev erdnîgarî bûye wargeha cejnên pîroz. Rojên ku bi berxwedanê, bi serfirazî encam bûne ji bo gelên li wê erdnîgarîyê bûye cejn û di çanda wan gelan de bi şadî û serfirazî her hatiye pîrozkirin. Cejna Newrozê yek ji van cejnên giranbuha û serekê ye.

Newrozê ruhê xwe ji berxwedan

û serkeftinê girtiye. Beriya çar hezar salan gutiyan bi navê Zagnûk cejneke pîroz dikir. Paşê hurri, qasît, mîtanî, ûrartû û medan ji vê pîrozbahiyê her domand. Ev ruhê pîrozbahiyê B.Z di 612’an de bi gurza Kawa ya ku li serê Dehaqê zalim ket û bi wê gurzê zilma Dehaq bi dawî bû, bû nişan û sembola serkeftina berxwedanê ya pîroz û giranbuha. Ji wê rojê û şûn de tenê ne li Rojhilata Navîn li nav tevahiya gelên ku li hemberî zaliman li ber xwe didin bi dilşadî têt pîrozkirin.

Li ser axa me ji bo ku ew cejn were pîrozkirin di dîrokê de gelek rojên dijwar hatine jiyîn. Ji dêlva ku Newroz li gor wateya xwe ya aşî, serfirazî û yekitiyê were pîrozkirin, hin caran bi qedexê û kuştinan, hin caran jî bi qedexekirina al û govendan ev roja pîroz hatiye jiyîn. Dewletê her xwestiyê naverok û ruhê Newrozê vala bike û bi merasimên derew xwedî li wê rojê derketiye. Û pîrozbahiyên di wateya cejna Newrozê de jî wekî çalakîyên terorê bi nav kirine û qedexê kirine.

Ta ku ciwanên kurd arê Newrozê bi bedena xwe vebixin. Yek ji van ciwanan Zekiye Alkan bû. Ez wê demê karmend bûm. Roja 20’ê Adarê (sêşem) ji kar derketim wekî her carê di sa meşiyam çûm parka Hesen a li ber bircên Amedê, li taxa Derê Çiyê.

Zekiye Alkan û hin ciwanên din li wê derê bûn û ez jî çûm wekî her gavê runiştim û em ketin sohbetê. Zekiye ji min strana Eyaz Yûsif (Zaxoyî) ya bi navê Newroz xwest ku ez bêjim. Piştî sohbetê me ez û Zekiye em rabûn meşiyam çûn taxa Ofîsê lokala PTT’ê (li dewsa lokalê îro bûye şubeya PTT’ê) em rûniştin me sohbetê xwe berdewam kir. Di wê navberê de gerîndedeyek (midûr) min (yê bi navê Erdogan Vursavaş) hat li ba me rûnişt û kêfxweşiya xwe ya ku cara yekem jinek diçe wê lokalê anî ziman. Piştî em rabûn Zekiye ji min di sa strana Eyaz Yûsif ya Newrozê xwest ku ez bistrêm, di meşê de min daxwaza wê bi cih anî, stran got. Ew çû malê ez jî çûm mala xwe. Ji sedema ku pîrozbahiyên Newrozê qedexebûn li her derê dagirker cih girtibûn û tevahiya qad û kûçe di bin qontrola wan de bûn. Roja Newrozê sibehê çûm kar lê di navberê de çûm pirtûkxaneyê ya bi navê Amed Kîtabê. Li wê derê kek Xetîp Dicle û xwe-di-yê pirtûkxaneyê Meheme tenê bûn û gelek sar û bêkêf bûn. Dema çav li min ketin pîrsa wan ya yekem, “Weysi Zekiye îro li ser bircê bi bedena xwe arê Newrozê dadaye.”

Piştî vê gotinê min fêhm kir ku ji

bo çi strana Eyaz Yûsif dixwest ez bistrêm.

Eyaz dibêje; “Ew Newroza bîka ciwan, Agiri hilkin serê rêkê”

Lê Zekiye pê nehatiye ser ku li serê rêka agir vêxe. Wê bi qasî pîroziya Newrozê bi bedena xwe ya delal wî agirî li ser bircên Amedê dadaye û tîrêjên ew agirên pîroz ji gelan re bûne silava serfiraziyê û ji dijmanan re jî bûye arê dojhê. Arê bedena Zekiye bû mînak û Rehşanan, Bêrivan û Ronahiyan ev agir hêj geştir kir.

Dijmin bi heman rengî ne. Sedam dema ku Eyaz Yûsif da kuştin (hin dibêjin jahri kir, hin jî dibêjin xeniqand) Eyaz 26 salî bû. Lê bi stranên xwe kelemê çavên neyarên bav û kalên xwe bû. Hûnandina helbestê ya bi rêsiyên muzîkê re dibû tîr û di dilê dijmin de diçû xwar. Ka em yek ji stranên Eyaz a ku heta mirinê di guhê Zekiye de bû, binihêrin.

Peyva min a paşî, ew neyarê guhker, çavkor, mejî genî û xwîn-xar, bila bibihîzin, bibînin û rind pê bizanibin ku ruhê Newrozê yê azadî û serkeftinê her dijî. Û kesên xwediye vê mîrateyê dîr an jî nêzik ew ê bigihîjin azadî û serkeftinê. Newroz berxwedan e. Newroz pîroz be!

Min heta niha dilê xwe ji kesî re venekiriye, sira xwe nedaye der û birîna xwe nişani kesî nedaye. Lê min di her firsendê de gotiye, ez yek ji wan kesên bi şans im ku nehatime girtin û di îşkenceyên giran re derbas nebûme. Ji nîfşê min ên nehatibin girtin û îşkence nedîtibin pir kêmin. Gelek ji dost û hevalên min demên dirêj di girtûgehan de mane û îşkenceyên giran ditine. Ew bi çihana derve re rûbiken bin jî, di agirê hundirê xwe de dişewitin. Ew carina bi qerf behsa îşkenceyên xwe bikin jî, ji nişkê ve ewrekî xemgîniyê xwe bi ser wan de digire û ew kenê wan tavilê li wan dibe girî. Ew di hundirê traumayên mezîn de ne. Digel ku wan jî xwe re rê û metodên şexsî peyda kiribin û bi salan bi traumayên xwe re xebitîbin jî, lê her ku ew di nav salan re diçin, biranînên wan li wan zinditir dibin û wan di nav xemgîniyê de vedigevizînin.

Sira ez ê niha ji we re eşkere bikim, ne salên min ên girtûgehê, ne jî îşkenceyên li min hatine kirin; na, lê şûna du kêrên xedar in.



### Firat Cewerî

## Şûna du kêran

Her cara ez xwe tazî li hemberî neynikê dibînim, ez bi şûna kêrên di laşê xwe de dihesim. Ew kêrên ku li nêzikî dilê min ketine û du birîn di laşê min de vekirine, ev çil û du sal in bi min re dijîn. Berî bi çil û du salan ez xortikekî naşî bûm, hê rih û simbelên min derneketibûn, lê ez di sa jî bi hewesa şoreşê ketibûm.

Di wan salan de rîya min bi bajarê Tirkîyê yê bi navê Turgutluyê ketibû. Ez û hin xortên MHPyî hatin hemberî hev û me mînaqêşeyekê germ li dar xist. Piştî bi demê mînaqêşeyê me derbasî xirecir û pevçûna devkî bû. Gava bû şev û tarî ket erdê, wan xortan rîya min birrîn û bi kêran derketin pêşiya min. Piştî du kêran ez deverû ketim xwarê. Welê xuya bû ku armanca wan kuştina min bû. Gava wan dit

ez ketim û li erdê dirêj bûm, wan got belkî ez mirim, loma dev ji min berdan, baz dan û çûn.

Ez piştî demêkê, bi birînen giran, bi zorê ji erdê rabûm. Roja piştî wê, êşê li min girantir kir. Ez hefeteyekê li erdê mam û bi rojan bi wê êşê jiyam.

Çil û du sal di ser darbeyên herdu kêran re bihurîne. Min ji mêj ve salên naşitî û xortaniyê li dû xwe hiştine. Lê şûnên herdu kêran mane, wînda nebûne û mîna te du fasûliyên hişk li ser kêlekê têt de çikandibin, xuya dikin. Gava kurê min ê pêşî nuh bi ser lîngan ketibû û dest bi peyvê kiribû, rojekê tilîka xwe ber bi şûnên herdu kêran ve dirêj kir û bi mîraq ji min pîrsî:

- Ew çi ye baba?
- Şûnên kêran in, kurê min, min

gotibû

- Na, tu derewa dikî.

Di zîmanê swêdî de gotina “derew” ne wek ya me giran e, carina dikare were maneya “henek” jî. Mîna ji kurê xwe re behsa ferqa henek û derewan kiribû, lê ya rastî, min jê re ne henek, ne jî derew kiribû. Gava ew mezintir bû, temenê wî gihîşt dehan, wî di firsendeke din de di sa birînen min mîraq kir û min di sa eynî bersiv dayê;

- Şûnên kêran in, kurê min.

Kurê min vê carê keniya û bi henek li min vegehand:

- Tu henekan dikî, baba, tu dixwazî xwe mîna Herkules nişan bidî.

Hingî min û kurê xwe bi hev re filmek li ser jiyana Herkules dîtibû. Herkulesê ku di şer û pevçûnan de bû, ji gelek deverên xwe birindar

dibû.

Dem bihurî. Kurê min ê pêşî mezîn bû. Kurekî min ê din çêbû. Gava ew hat temenê kurê min ê yekemîn, wî jî mîna birayê xwe eynî pîrs ji min kir û min eynî bersiv dayê. Îro herdu kurên min nizanibin kê ew kêr li min xistine jî, dizanin ew birînen nêzikî dilê min şûnên kêran in.

Niha herdu kur bi firê ketine, lê xwişkêka wan ya biçûk heye. Wê heta niha birîna min mîraq nekiriye. Heke ew rojekê tilîka xwe deyne ser birîna min û bipirse, ez ê eynî bersivê bidimê.

Ez nizanîm wê keça min çawa pêşwaziya bersiva min bike, lê ez dizanîm êşa şûnên herdu kêrên nêzikî dilê min ne mîna êşên hundirîn ên hevalên min in. Êşa laş û ya ruh ne wek hev in; êşa laş şopekê li dû xwe bihêle jî, birînen ruh xedar in, cebirandin û kewardina wan zehmettir e.

Ez nizanîm, belkî ya min jî ji birîneke laşî wêdetir bûbe ya ruhî, loma ew bi min re dijî û min heta niha ji bir nekiriye ...

# NEWROZ PÎROZ BE

Agirê Newrozê carekê  
di dilê me de pêketiye,  
li her derê dilê me germ dike,  
dê tu carî venemire!

Newroz pîroz e, dê her pîroz be.  
**Agirê Newrozê bi hezaran sal in  
venemirî û dê tu carî jî venemire.**

Mîrasa berxwedana Kawayê  
Hesinkar, bi hezaran sal in hêviya  
me geş, siberoja me ronî dike. Her  
çend, ji ber nexweşiya Koronayê,  
em **Newroza 2020'an li qadan  
pîroz nekin jî, dilê milyonan bi  
hev re ye.** Li dijî zilm û zordariyê,  
em bi ruhê berxwedêr ê Newrozê  
pak û paqij dibin. **Rengê biharê,  
agirê Newrozê li her derê me  
germ dike, dilê me geş dike.**  
Findek jî, çirûskek jî dikare tarîtiyê  
ronî bike. Newroz berxwedan,  
piştevanî û palpiştî ye. Em ê bi vî  
ruhî li dijî her cure neheqî, zilm,  
talan û nexweşiyên tevbigerin. Ji  
ber nexweşiya Koronayê em nikarin  
li qadan Newrozê pîroz bikin, lê  
**agirê Newrozê carekê di dilê me  
de pêketiye û dê tu carî jî  
venemire.** Bi hêviya di nav gelan de  
bibe wesîleya azadî, biratî, wekhevî  
û piştevaniyê,  
**em Newroza gelên  
xwe pîroz dikin!**

